KT

Zanîngeha Mardîn Artûklûyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

# ÇÎROKÊN GELÊRÎ YÊN DERASAYÎ JI HEREMA DÊRIK A ÇIYAYÊ MAZÎ Û MOTÎFAN WAN

Seyitbatal ERGİN

12721109

Şêwirmend

Doç. Alk. Dr. Necat KESKİN

Mêrdîn 2018

T.C

Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Kültürü ve Dili Anabilim Dalı

Tezsiz Yüksek Lisans Projesi

# DERİK YÖRESİNDEKİ OLAĞANÜSTÜ HALK MASALLARI VE MOTİFLERİ

Seyitbatal ERGİN

12721109

Danışman

Yrd. Doç. Dr. Necat KESKİN

Mardin 2018

KT

Zanîngeha Mardîn Artûklûyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

# ÇÎROKÊN GELÊRÎ YÊN DERASAYÎ JI DÊRIK A ÇIYAYÊ MAZÎ Û MOTÎFAN WAN


Seyitbatal ERGİN

12721109


Şêwirmend

Doç. Alk. Dr. Necat KESKİN

Mêrdîn 2018

**T.C**

**Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü**

**Kürt Kültürü ve Dili Anabilim Dalı**

**Tezsiz Yüksek Lisans Projesi**

# DERİK YÖRESİNDEKİ OLAĞANÜSTÜ HALK MASALLARI VE MOTİFLERİ

**Seyitbatal ERGİN**

**12721109**

**Danışman**

**Yrd. Doç. Dr. Necat KESKİN**

**Mardin 2018**

**NAVEROK**

KURTE ........................................................................................................ vii

ÖZET........................................................................................................ vii

DAXUYANÎ ........................................................................................................ viii

BEYANAT........................................................................................................ ix

DESTPÊK ........................................................................................................ 1

**1. Mijar û sînorên xebatê …………………………………………………………......1**

**2.Armanc û girîngîya xebatê .............................................................................. 1**

**3. Rê û rêbaz: ..........................................................................................................1**

4. Pirsgirêka xebatê:............................................................................... ………….1

BEŞA YEKEM

DERBARÊ SEHAYA DÊRİKA ÇİYAYÊ MAZÎ DE HİN XEBAT

1. Dêrik:........................................................................................................ 2

**1.1 Dirok.....................................................................................................................3**

**1.2 Dewletên ku li Dêrikê hikimdarî kirine..............................................................................5**

**1.3 Erdnîgarî .................................................................................................................5**

**1.4 Nexşeya Dêrikê ......................................................................................................5**

**1.5 Cihên Navdar û Dîrokî yê Dêrikê .......................................................................6**

**1.6 Jiyana Rewşenbirî .................................................................................................6**

**1.7 Çend Helbestên Li ser Dêrikê...............................................................................6**

BEŞA DUYEM

ÇÎROKÊN GELÊRÎ Û ANALÎZA WAN

2,1. Senifandina Çîrokê........................................................................................................ 9

2,2. Nûnerên Çîroka Kurdî........................................................................................................ 9

2,3. Smith Thomson û di Çîrokan de Motîf ........................................................................ 10

**2,3.1. Motîf ....................................................................................................10**

**2,3.2. Senifandina Motîfan...........................................................................................10**

BEŞA SÊYEM

DI ÇÎROKÊN GELÊRÎ YÊN DERASAYÎ YÊN

HERÊMA DÊRIKA ÇIYAYÊ MAZÎ DE MOTÎF


3.MAR Û MÎROV,  XEWNA PADİŞAH ..... 12

**3.1 KURTEYA ÇÎROKÊ.....12**

**3.2 MOTÎFÊ Dİ ÇÎROKÊ .....12**

4.MEÛJ Û HİRÎ Û JİNA QENC..... 13

**4.1 KURTEYA ÇÎROKÊ.....13**

**4.2MOTÎFÊN ÇÎROKÊ.....13**

5. SÊ LAW Û SÊV ..... 14

**5.1 KURTEYA ÇÎROKÊ.....14**

**5.2 MOTÎFÊN Dİ ÇÎROKÊ .....15**

6. SİLTANA KÛBAR Û EHMET Û ZİLFO MALA ONDEBAŞÎ..... 16

**6.1 KURTEYA ÇÎROKÊ.....16**

**6.2 MOTÎFÊN ÇÎROKÊ.....16**

7. NE SAR NE PEYA..... 18

**7.1 KURTEYA ÇÎROKÊ.....18**

**7.2 MOTÎFÊN ÇÎROKÊ.....18**

8. FATMA SÊWÎ..... 19

**8.1 KURTEYA ÇÎROKÊ.....19**

**8.2 MOTİFÊN ÇÎROKÊ.....19**

9. QAFÊ NAV COT..... 20

**9.1 KURTEYA ÇÎROKÊ.....20**

**9.2 MOTÎFÊN Dİ ÇÎROKÊ .....20**

10. QEDER ..... 21

**10.1 KURTEYA ÇÎROKÊ.....21**

**10.2 MOTÎFÊN Dİ ÇÎROKÊ .....21**

11. Çavkanî yê Zindî..... 22

12.ÇAVKANÎ ..... 23

13.PÊVEK..... 24

**13.1 MAR Û MÎROV,  XEWNA PADİŞAH .....24**

**13.2 MEÛJ Û HİRÎ Û JİNA QENC.....28**

**13.3 SÊ LAW Û SÊV.....31**

**13.4 SİLTANA KÛBAR Û EHMET Û ZİLFO MALA ONDEBAŞÎ..............................34**
**13.5 NE SAR NE PEYA.....................................................................................37**
**13.6 FATMA SÊWÎ..........................................................................................38**
**13.7 QAFÊ NAV COT.......................................................................................40**
**13.8 QEDER...................................................................................................43**

# KURTE

Li dinyayê û li welatê me çîrok bûne mijara gelek proje, tez û lêkolînan. Li herêma me çîrok piranî bi piranî van qaliban: “Carek ji caran, rehmet li dê û bavê hazir û guhdaran, yên me jî yên we jî’’, ‘’Rojek ji rojan rehmet li dê û bavê hazir û guhdaran’’, “Carek ji caran, rehmet li dê u bavê hazir û guhdaran’’, “Hebu tunebu, rehmet li dê û bavê min û we guhdaran bu” dest pê dike û armanca çîrobêjî ew e bala gundaran bikêşe ser çîrokê.

Çîrok, cureyek ji Wêjeya Kurdî ya devkî ye. Çîrok, bi saya sere çîrokbêj, dengbêj, stranbêj û hwd. gihaye roja me. Lê mixabin ji bo sedema derketina televizyon, înternet, zêdebûna pirtûkan û hwd. çîrok roj bi roj hatiye ji bîrkirin. Ji ber ku di nav kurdan de xwendevanî kêm bû, berhevkirin û qeydikirina wan gelek kêm çêbûye. Yên di demê de nehatîn qeydkirin wekî mirov guhdarî dike, mirov dibîne kêmasî têde çêbûne. Vê jî çîrokbêj dibêje. Sedema wê jî ew e ku ve salane nehatine gotin. Wekî mirov guhdarî dike, mirov dizane kêmasiyek tê de heye. Di çîrokên me de gelek tişt jê winda bûne. Di vê xebatê de ez li ser berhevkirina çîrokên derdora Dêrika Ciyayê Mazi û motifên di wan de derbas dibin em ê bisekinin. Motif di çîrokan de gelek girîng e. Her motîfek sembola hebûnêkê ye.

Peyvên Sereke: Çîrok, Çîrokbêj, berhevkirin, motîf, motîfên sereke,Dêrik

# ÖZET

Masal dünyada ve ülkemizde birçok proje, tez ve araştırmanın konusu olmuş. Bölgemizde daha çok masal şu tekerlemelerle: ‘‘Carek ji caran, rehmet li dê û bavê hazir û guhdaran, yên me jî yên we jî’’, ‘‘Rojek ji rojan rehmet li dê û bavê hazir û guhdaran’’, “Carek ji caran, rehmet li dê u bavê hazir û guhdaran’’, “Hebû tunebû, rehmet li dê û bavê min û we guhdaran bu” başalar. Masalcının amacı dinleyicinin ilgisini masalın üzerine çekmektir.

Masal, Kürt Halk Edebiyatının sözlü ürünüdür. Masal, masalcı ve ozanlar ve benzeri sayesinde günümüze kadar gelmiştir. Fakat kitap, televizyon ve internetin çıkmasıyla masal günden güne unutulmuş. Kürtlerin içinde okumuş olanlar çok az olduğundan masaları derleme ve kaydetme çok az olmuştur. Zamanında kayıt altına alınmayanlar insan dinlediği zaman, insan onlarda bir eksiklik hissedebiliyor. Bunu da masalcı belirtiyor. Bunun sebebi de yıllardır söylenmemiş olmasındandır. İnsan dinlediği zaman, bir eksiklik olduğunu fark edebiliyor. Bizim masallarımızda birçok şey kaybolmuş. Bu çalışmada Derik ve çevresinde derlenen masal ve bu masallarında geçen motiflerin üzerinde duracağız. Motif masalarda çok önemlidir. Her motif bir varlığı sembolize eder.

Anahtar Kelimeler: Masal, Masalcı, derleme, motif, dêrik .

# DAXUYANÎ

Di amadekirina vê berhemê de min rêzikên etîka zanistî li ber çavan girtine. Heke min berhemek bi kar anîbe, teqez li gorî bendên zanistî min bal kêşaye li ser van berheman. Dîsa

çi berhemên ku min bi kar anîn çi jî kerestey ên ku min berhevkirîn, hingî ji min hat, min parastine, min nehêleye çi tehrîfat bigihîjin wan.

## BEYANAT

Bu çalışmamada bilimsel etik kurallarını göz önünde bulundurdum. Eger bir eser kullanmışsam bilimsel çalışmalar çerçevesinde kaynaklardan faydalandım.faydalandığım eserlerin de zarar görmemesi için de itina ile özen gösterdim.

# DESTPÊK

**1.1. Mijar û sînorên xebatê**: Derbarê Sehaya Çîrokên Dêrika Çiyayê Mazi

**1.2. Armanc û girîngîya xebatê**: Armancameya vê projê ew bû ku em çîrokên li derdora Dêrikê ji kesên pîr berhev bikin, qeyd bikin û binîvîsînin. Çîrokbêj çîrok çawa got me werê nîvîsî. Armancame da ku zimanê tê gotin bê nivîsandin. Ji ber wî awayî me devoka çîrok hat gotin qeyd kir û nivîsîn. Ji bo ku neyên ji bîr kirin. Berhevkirina çîrokên gelêrîyên heremê girîngîya devoka Dêrîkê ye.

**1.3. Rê û rêbaz:** Di vê lêkolînê de berhevkirina çîrokên gelêrîyên herêma Dêrikê ji çîrokbêjan Zana û pîrên heremê bi nîvîs û qeyda dengê bê kirin. Piştî berhevkirin û nivîsawan analîz tespîtkirina motîfên têde yên cûrbicûr bê kirin.

**1.4. Pirsgirêka xebatê:** Di çîrokan de ji ber kêmasîya perwerdeya zimanê Kurdî tunneye û bandora televîzyonê zêde li ser jiyana mirovan kiriye çîrokên me hatiye ji bîr kirin û di nava çîrokê de peyvên Turkî tê bikaranîn. Ev jî dide xwûyakirin ku çîrokên me ji kal û pîran nê qeyd kirin û nê nivîsandin wê di demek nêz de bê ji bîrkirin.

# BEŞA YEKEM

# DERBARÊ SEHÊYA DÊRİKA ÇİYAYÊ MAZİ DE HİN XEBAT

## 4. Dêrik:

Dêrik sehaya wê 1397 km2 yi. hejmara wê 30 hezar mêr 31 hezar jini.heta 1923 a girêdayi amedê bû , piştî wê bi mêrdîn ve hatiyi girêdan. navçe ji pişta xwe dayi çiyayê mazî û bberê wê ji li deşta qoser û ceylanpınari. hewawê heşkê. zivtanî sar berf û barani, havînî ji germi millet li ser baniyayi.
dêrik welatekî kevnari şikefta qîza qrêl,kela rebetê, warê sîsanê, dêra metîna, kela bircê,xirbê fitnê, xirbê zorava, xirbê kerkuştê , tilbisim bi cîna em dizani kû dêrik welatekî kevnari.

dErik debara xwe bi candiniya erdan pêk tîni û bi xwedîkirina jalan pêk tîni. zeytûnê wê li cîhanê bi nav û dengi.

Dêrika Çiyayê Mazi
Dêrika Çiyayê Mazî an jî Dêrik (bi tirkî: Derik ). Dêrik ser bi Parezgeha Mêrdînê ye.

## 4.1 Dîrok

Di sala 1874'an de dezgeha şaredarî li Dêrikê hatiye damezrandin û ji dest pêkê heta sala 1923an bi Amedê ve girêdayî bû. Ji sala 1923an û pê ve bi Mêrdînê ve hatiye girêdan. Li gora serjimara îniya di Cotmeha sala 1927'an de, li navenda navçeyê 528 mal, 38 dikan, Mizgeftek û Dêrek hebû ye. Dîsa li gora vê serjimarê, serjimara bajêr li ser hev 6930 kes in û ji vana 1370 mêr û 1278 jî jin in. Tevî jimara gundên li ser hev serjimara bajêr 15 111 kes in û ji vana jî 8181 kes pîrek û 6930 kes jî mêr in.

Dêrik, sê aliyên wê bi çiyayên asê ve girtiye, pişta wê li Çiyayê Mazî û berê wê li Wêranşar û li beriya Serê Kaniyê ye. Beriya Dêrikê ji quntêna Çiyayê Mazî dest pê dike û her ku ber bi deştê ve dadikeve bilindahîya erdê wê nizim dibe. Li ser milê çepê sînorê erdê wê dighêje deşta Qoserê û îklima wê, zivistan û havînan bi dijwarî derbas dibin.

Pal û berwarên Çiyayê Mazî bi piranî dar û deviyên berrî û mazî nin. Di van salên dawî de, her ku diçe dar û devî zêdetir dibin. Li beriya Dêrikê her çiqas cihên qeraç hebin jî erdên bi bereket pirtir in û li van erdan weke genim, ceh, nîsk û nokan tên çandin. Piştî ku di van salên dawiyê de hin bendav û pengavên li mintîqeyê çêbûn û gelek bîr hatin kolên, çandiniyên weke penbo, garis, kuncî û bîstanên avî jî zêdetir bûn. Li erdên şehar û heta bi palên Qerejdaxê jî çiltûkeke bi xêr û bereket tê çandin. Ji xêndî van tiştên jî bi dehan perçeyên zeytûnên, rezên tirî û baxçeyên ji darên hinar, hijîr, mişmiş, gwîzan û ji her cûreyî fêkî pêk tên, henin.

Debara kesên ku li nava bajêr rûdinên, li ser deman û cenaniya rez, zeytûn û baxçeyan e û beşekî piçûk jî bi dikandarî û bazirganiyê re mijûl dibin. Debara gundiyên ku li hêla çiyê rûdinên, li ser xwedîkirina pez û hejik û êzingan e. Yên beriyê ji li ser çandinî û zîraetê ye. Ji xêndî zîraetê, tu tiştekî ku zêde bê kirin tune ye.

Di dîroka Mêrdînê de, kîjan dewletê û kîjan şaristaniyê li ser Mêrdînê hikum kiribe, Dêrik jî ji xwe re ketiya bin hikumdariya wan.

Heta demeke nêzîk jî qismekî mezin ji rûniştvanên Dêrikê, Ermenî bûn. Di van salên dawî de, ji ber sedemên aborî, civakî û siyasî, Ermeniyên Dêrikê ber bi Stenbol, Sûrî, Ewrûpa  û Emerîkayê koçber kirin. Vê gavê jî bi qandî du-sê malbatên wan li Dêrikê manin. Di dema xwe de, qismekî mezin yê pîşesaziyê (seneetkarî) di destê Ermenîyên de bûn. Yek ji wan avahiyên dîrokî, Dêra Sor e ku li ser navê Ermeniyan maye. Li gora rîwayetê tê texmîn kirin ku Dêrikê navê xwe ji vê dêrê wergirtiye.

Zeytûnên Dêrikê
Hinarên Dêrikê
Hejîrên Dêrikê
Dêrik ji hêla av, kanî û çeman ve dewlemendiyeke herêmê ye. Piranîya çeman zivistanan der dibin û biharan heta bi serê havînan diherikîn. Lê piraniya wan, havînan dimiçiqin. Çemê Xabê, Çemê Şêbê, Çemê Zorava û Çemê Circibê hin ji wan çeman in. Ji xêndî van çeman jî, hin gol û barajên (bendav) ji bo avdanê û bi navê Kunreş, Sûbetan, Qurixî  û Sêpnatê ku ji terefê dewletê ve hatinên çêkirin, henin.

Zeytûn, hinar û hejîrên Dêrikê gelek navdar in.

## 4.2 Dewletên ku li Dêrikê hikimdarî kirine

Beriya Zayînê

3000 [[urartu]

2350 Akkad û Sumer

2300 Akkad

2216 Sumer

1800 Babîl

1595 Kasî

1350 Asur

612 Med

585 Pers

330 Îskenderê Mezin

327 Selefkos

129 Part

83 Tigranê Mezin (Mlûkatiya Ermenîyan)

66 Romayî

Piştî Zayînê

200 Sasanî

600 Bi rê ve birina Arûsê Carîs

639 Feth kirina Ordiya İslamê ku di bin serokatiya Îyad B. Genam. (Dewra Hz.Emer)

639-739 Dewra Marîye ya Arsûs û lawê wê Amuda ku li Mêrdînê berî her kesî ola İslamê pejirandibun.

739-837 Di nav van salan de Dêrik û derdora wê xerabe man.

837-894 Dewra Milûkê Misûlê Al î Hamdan

894 Ji aliyê Xelîfe Mu'tadıt Bîllahê 16a Mêrdîn û derdora wê hat valakirin

930-977 Bi rê ve birina Nasiruddevle Hesen

977-1084 Mervanî

1105-1400 Dewleta Artûkî

1394 Talan û dagira imparatorê Moxolan Tîmûr

1400-1468 Dewra dewleta Karakoyunlî.

1468-1507 Dewra dewleta Akkoyunlî.

1507-1515 Dewra Sefewiyan.

1515-1923 Împaratoriya Osmanî

1923 Dewra Komarê

**4.3 Erdnîgarî**

Dêrik bi ser sînorê Şemrex, Qoser, Serê Kaniyê û Wêranşarê ve ye. Qasî ku tê zanin ew, di navbera salên 1390 û 1400î de, ji terefê du qebîlên eşîra Têrrikan ku bi navên Mala Dawidê Kalo û Mala Qeya ye, hatiye ava kirin. Ji ber wê, heta niha jî ew cihên ku di dest pêkê de bûne cîhê avahiyê, bi navê Rezê Mala Dawidê Kalo û bi navê Mêrga Qeya tên bilêv kirin. Li ser kuştina mîrekî zilimkar ku li mintîqeya Amedê bi navê Rût Heso (Hesoyê Rût) dihat bi nav kirin, ev herdu qebîlan mecbûr manin koçî cîhê ku îro navenda Dêrikê ye, bikin.
Rûpîvana Dêrikê 1397 km² ye û li gora serjimara di sala 1998an de hatiye tesbît kirin ku nifûsa navenda navçeyê 19 hezar û 750 kes in. Nufûsa navçê di serjimara di sala 2000an de jî bûye 20.700 kes.

Raqima Dêrikê 780 metre ye û bilindahiya çiyayên wê 1500 metreyê derbas nakin. Çiyayên wê bi navê Çiyayên Mazî tê bi nav kirin. Dêrik bi berriya xwe jî, li ser sînorên deşta Herana ku heta dighê erdên Nisêbînê ye. Berriya Dêrikê, bi kevirên şehar (volkanîk) yên ji girqîjotên ji beriya dîrokê de teqiyane û li wan derdoran belav bûne ve dagirtiye. Vê gavê jî ji wan girqîjotan, madeya ku bi navê "kilinker" e û di çêkirina çîmento de wek havên tê bikaranîn, derdikeve.

## 4.4 Nexşeya Dêrikê

## 4.5 Cihên Navdar û Dîrokî yê Dêrikê

Xirbeyên Ofiyê

Xirbeyên Fitnê

Kela Rebetê

Kela Dêra Metînan

Tilbisim

Qesra Qenco

### 4.6 Jiyana Rewşenbirî

Ji Dêrîke gelek kesên rewşenbîr, nivîskar, muzîkar derketine. Nivîskar û helbestvanên weke Edîp Karahan Qedrîcan Reşîdê Kurd Bûbê Eser Enwer Karahan Firat Ceweri Hogir Berbir Lokman Ayebe Ronî War H. Kovan Baqî Erkan Özgen Elîxan Loran Firat Ceweri Rêzan Tovjîn Wênesaz Fewzî Bîlge Osman Özcelik Eyyüp Güven Rodi zinar û gelekên din.

Koma mûzîkê ya Koma Azad di sala 1987an de ji aliyê Bawer Can û Turhan Yapıştıran li Dêrîkê ava bû.

## 4.7 Çend Helbestên Li ser Dêrikê

Ji Qedrîcan re
I
Ey hevalo delalo, tu her tiştî dizanî
Di zimanê me kurdan tu wek melayê Xanî,
Tu xortekî çeleng î ez kalekî zemani
Dil û gerden şikestî bendewarê xizanî,
Xwedê te xweş bihêlî, tu xortekî ciwan î.

Erê rûyê te roj e, tava wê da diyara.
Devê te wek bişkoj e, nû derkevî ji xwe re.
Serê te kehruba ye, mû distinî ji me re.
Ayîneya Skender, çavê te bû li Dara.

Birhên te pîr zirav in her dû wek du kevana
Pozê te î çilakî, sade ji zêr û zîva,
Bejna te ya Siyamend li zozanê Farqînaa,
Sondê dixwim bi atêş bi wî xirqê kirîva,
Li ber tava te mane Zaz û tor û Brîva.

II
Dêrik çi xweş e bi dar û av e,
Ev ave, li her derê belav e.

Yek xab e belê, bihuşt û mawa.
Pir mişmiş û sêv û dar û selwa.

Pir gwîz û hejîr û xox û hinar,
Pir kanî û aş û av û cobar.

Yek dî heye pê dibên Kulêbê,
Gorî ne ji wê re Xurs û Şêbê.

Pir aveke sar û pak û şêrîn,
Pir dar û ber û gîyahe rengîn.
Bilbil digirî bi ah û zar e,
Daxwez bi xwe komala Hewar e.
Mizgîn didî ew heval û yare,
Qedrî ko li Şamê xwendewar e.
Çepkan dikutin dibên birawo,
Gorî te bibin xweh û birao

— Cegerxwîn
Cegerxwîn[1]
Di dema heşê min wenda dibûyî
Mizgînek ji min re hat û got: bixwîn
Min cegerperitî, min dilhilûyî,
Mêze kir ev mizgin i navê Cegerxwîn

Hevalê xoşewîst pesna gundê min,
Bi ah û keseran pêşkêş didî min.
Ji nû ve pêtek ar, da ser daxê min
Derd û kul tevdayîn tewşe Cegerxwîn!

Dêrik pir xweş e hêja ye pesnê;
Çi bikim nakev dest; ji ber vê xesmê
Bi dil birîndar in kurdên vê neslê
Ne ez û tu tenê hemî Cegerxwîn!

Ma Maden hindik e ji darên heran
Osmanye, Sêwerk, Mûşa-Serhedan.

Ji çayê Torozê het Deşî-Rewan,
Gi xabin! Hin çêtir bizan Cegerxwîn.

Dizanim tu zanî, welat giş xweş e,
Hin bajar hene ko tu lê na meşe
Mesela Elezîz çi lawkeleş e
Bidîta bi çavê şihrê Cegerxwîn.

Hevalo tu xweş bi; tim bi dilê xwe.
Welatê bihuştin tim bi sazê xwe,
Saz bikî di nava tilyên destê xwe
Da nezan bizanin tu yî Cegerxwîn.

# BEŞA DUYEM

# ÇÎROKÊN GELÊRÎ Û ANALÎZA WAN

## 1. Senifandina Çîrokê

Gelek lêkolîner, nivîskar û folqlornasan çîrok senifandinen. Li gor Mûhsînê Helîmoğlû, Yavuz senifandina çîrokan eve:

A. Çîrokên Awerte
B. Çîrokên cin û perîyan
C. Çîrokên mirovên ne asayî
D. Çîrokên sehr û efsunê
E. Çîrokên dê û pîrhevokan
F. Çîrokên Padîşah, Şehzade, Siltan û Wezîran
G. Çîrokên Dewlemendan, Bazirganan, Axa û Began
H. Çîrokên mirovên xizan
Î. Çîrokên Ajelan
J. Çîrokên bîvêj û gotinên pêşîyan

Hinek nivîskar hejmara cûreyên çîrokê hîn hindik dikin û raveyî xwendekaran dikin. Li gorî Yalçin û Aytaş cûreyên çîrokê vanane:

1. Çîrokên Ajelan
2. Çîrokên Aferîdeyên ne asayî
3. Çîrokên mirovên saf
4. Çîrokên ku behsa sêhr, efsûn û tiştên ne asayî dikin

## 2. Nûnerên Çîroka Kurdî

Celadet Alî Bedirxan li ser nivîs û berhevkirina çîrokan gelek xebatên wî çêbûye. Wî di nivîsên xwe de ji bilî navêxwe bernavkê çîrokbêj jî bi kar anîye. Di nav rûpelên hawarê de wekî çîrok, çîrçîrok, destan, efsane, muzîk, gotinên pêşîyan.

## 3. Smith Thomson û di Çîrokan de Motîf

Kataloga motîfên gelêrî ji alîyê Smîth Thomson ve hatiye amadekirin. Navê pirtûkê motîf îndex of folk lîteraturêye. Stith Thomson her cûreyekê motîfan bi peyvekê nîşan dide. Piştî vê pirtûkê xebatê mezin li ser folklora cîhanê hatiye kirin.

### 3.1. Motîf

Li gor Bunyamîn Demîr motîf hêmana herî bi çûk a çîrokane ku di vegotên gelêrî de her dem tê dubare kirin. Di nava xwe de sîmgeyan dicivîne û ji bere de xwedî qabîlîyeta jiyînê ye. Motîf hêmanen sereke yên çîrokanin. Bêyî motîfan vegotinên gelêrî nayê ava kirin. Her weha li gor zanyarê Rûsî Meselovskî motîf ji babetê jî girîntir e û çîrok bi hevkirina motîfane.

### 3.2. Senifandina Motîfan

Ji ber ku heya neha derheqên motîfan de di Kurdî de xebat nehatiye kirin pêşî emê kataloga motîfên çîrokan ya Stith Thomson bidin. Thomson ji bo senifandîna motîfan ji h er motîfekê re tîpek diyar kiriye û di binê van 2ê ser nava de û bi van tîpan rêz kiriye.

1. Ajalên Mîtolojîk

2. Ajal

3. Qedexe

4. Sîhr

5. Mirin

6. Derasayî

7. Motîfên Dêwan

8. Îmtîhan

9. Bê aqil û ehmeq

10. Xapandin û hîle

11. Beravajîbûna sûûdê

12. Tayînkirina pêşerojê

13. Şans û sûûd

14. Civak

15. Xelat û ceza

16. Esaret û firarî bun

17. Zilmên anormal

18. Cînsîyet

19. Xwezaya jiyanê

20. Dîn

21. Taybetmendîyên karakterî

22. Mîzah

23. Komên cûrbecûr yên motîfan

# BEŞA SÊYEM

# DI ÇÎROKÊN GELÊRÎ YÊN DERASAYÎ YÊN HERÊMA DÊRIKA ÇIYAYÊ MAZÎ DE MOTÎF

## 5. MAR Û MÎROV, XEWNA PADİŞAH

### 5.1 KURTEYA ÇÎROKÊ

Demên berên de ligor gotinê padîşahekî xewnek dîtiyi. dixwazi wateya xewna xwe bielimî, tella bera nav bajara didin welatî giş pê diese. yekî xizan ji bo kû ji xizaniyê xelas bivi û zarokê wî ji vî halê xizaniyê xelas bivi xwe didi ber mirinê.dehari cem padîşah lê ji wîr li hev tê mar tê pêşiya wî bi wî bi şerdê kû zêr li hev par biki alikar dibe xewna padîşah û wateya wê jêr dibê je. padîşah sê cara xewnê dibîne hercar bang li vî kesî diki. cara ewil dibîne gur bariyayi vateya wê her dibe wek gura xwîn xar, cara dudan rêvî dibîna herkes bûye wek rêviya, baweriya kesî bi kesî nayê, cara sisiyan mîh dibîne . wateyawê herkes bûye wek mîha herkes bi her kesî baweri. ev kes hercar dewlemend dibi lê îxanetê bi mar diki car gur û rêvî cara sisiyan ew jî dibi wek mîha û zêrê xwe gişî did mar.

### 5.2 MOTÎFÊ Dİ ÇÎROKÊ

**Mar:** Di vê çîrokê de mar kesekî qenc tê xwiyakirin, ne xapînoke.
**Rêvî :** kesên xapînoki, kesên ne rasti, kesên kû dahfika dikoli

**Gur:** gur êrîşkirini, pevçûni, zordestiyi, çav birçîbûni

**Mîh:** mih kesê feqîr, baqil, bêhn fereh,

**Bawerî:** mijara çîrokê li ser baweriyêyi, mirov bi mirovan ne baweri, her wext menfeata xwe difikiri, di jiyana insanan her tim çavbirçîbûn bi pêşve dikevi.

**Mehdî:** di baweriya me muslumana de mehdî motifek oliyi, mehdî aramîyi, xweşîyi, ji xwe elametê qiyametêyi jî.

**Xewn**: xewn rastiya jiyanê dide ber çavên me, di vê çîrokêde padîşah rastiya welatê xwe bi xewnê famdiki, dixwazi xewn be. Hin tişt heyi di rastiya jiyanê lê mixabin ji ber kû em naxwazin, an jî em dixwazin û em bi dest naxi, em dixwazin di xewnadi bijî.

# 6.MEÛJ Û HİRÎ Û JİNA QENC

## 6.1 KURTEYA ÇÎROKÊ

Go zemanê berê meûj dibirin bi hiriyê didan, got pênc şeş sakol barê xwe bar kir, gotin emê herin bi hiriyê bidin , wek ji beriyê duçûn zozên , got carekê dû cara got jinikê ji zilamê xwe gotiyi way hevalê te giş dehari barê xwe bi hiriyê didi hema tu jî heri, ey dibê temam, radibi barê xwe bar diki tevlî hevalan dibi, dehari binya gundekî baran destpêdiki, ji baranê kes kesî nabîni , hevalê wî gişa berê mahzûvanê xwe dîtibû, herkes dehari cem mahzuvanê xwe û vaya li wê rastê dimîni , wî jî serê hespa xwe baradayi û gotiyi hespa min çû kîjan malê ezê jî herim wêderê û hespa wi dehari ber deriyakî disekini,

dibe mêvan ew jî dixwazi mahzûban bive mêvanê wî lê ji ber kû jinawî naxwaze kes bive mêvanê wan xort dehari bi qîza dujminê xwe dizewice û dev ji jina xwe berdidi.

## 6.2MOTÎFÊN ÇÎROKÊ

Jin: din vir de jin a qen û xerab didi berhev

Mêvan: mêvantî, xizmeta mêvantiyê, qedr dayina mêvantiyê li nav me kurda gelleki girîngi, ku mêvan tê çi di malê de hebe li gor çanda me em di didi ber mêvanê xwe. Divir di jî ew qas giringi dehari eynê rojê di qîza dujminê xwe tîni.

**Dujminatî**: dijminatî din ava kurda herwext diqevimi û bûyi motifek vê çîrokê, têkçûna milletê bindest ji ber kû dijninatiya nav xweyi û di vê çîrokê de jî em dibînin.

Hesp: ji ber kû wesayet ji nuhda derketiyi û kurd jî xwedî dîrokek kevni, barkirin û bazirganî her wext bi hespê hatiyi kirin. Di vir de hesp bûyi rêber.

# 7. SÊ LAW Û SÊV

## 7.1 KURTEYA ÇÎROKÊ

Dibê carekê sê lawê yekî hebûyi, dibê bavê wan jêre gotiyi lawê min di qedara wede ezê herkê sêvekê bidim we.

Dawet çêbû heri sêva xwe bavêji, li serêkê ket ezê ji wer bixwazim dibê êmezin dehari dawet çêbûyi, dehari deavêji serê qîza miftî dikevi, radibi ji xwe bi dawet tîni, dibi ê ortê  ew jî wextê zewaca wî çêdibi , tê dawet çêdibi, dibê de heri lawê min tu jî heri sêva xwe beavêji, deavêji li serê qîza qadî dîkevi, herda jî ji xwe bi dawet û bi şeref tîni, dibê ê  çûk jî wexta wî tê ew jî dehari sê roja dawet çêbûyi,  ew jî sêva xwe deavêji sêva wî li hewa ziz dibi ziz dibi dehari li ber kevir kî li serê beqê dikevi, dibê de lawê min qirnê nebî sêcarayi de sibê jî heri, vêcarê de ji hêlek din sêva xwe deavêje dîsa sêva wî li hewa zîz dibi zîz dibi dehari li serê beqêe dîkevi. Dibê welleh lawêmin hew îro mayi dehari dîsa sêva wî li serê beqê ket, dibê her sê roja jî li serê beqê ket ,radihêli bêqe bi xwer dibi, welleh bavo her sê roja jî lî serê beqê ket, ey dibê welleh lawê min qedera te evi, ez tuydin ji ter nînim, her wa li perrêgund xanîkek heyi min her dû birayê te cîhê kir her tu jî cîhêbivi, her ji xwe têkevê.

beq cini dibi keçek xweşik , bavê lêwik bi layê xe ne rasti diwazi layê xwe kuştinkirin bidi û şerd û merca did ber lawê xwe bi xêra jina lêwik lav şerda bi cîh tîni.

Dehari dineri kû wa cawî di quncika cennetê de rûniştiyi, Dibê welleh bavê min ez şandimim gotiyi hela bê nifta xiznê kiriyi ku, dibê taqikek hey ili ber beştadeyi, nifta xeznê min kiriyi wêdera, û bavê te dûjminê te yi , ne dostê te yi, û êdî bavê te kîja şerda da berte gerek tu bavê xwe bikuji, vediger tê hela vê jinika tu li ser sêla sor limêj diki, dibê derdê te çiyi, dibê min mal radixist û min ji malê hezdikir, mala xwe min dixemiland ji kêfa malê min limêj nedikir, min rojekê ferza limêjê li ser van xalîça kiriba minê ana li ser limêj bikira, min li ser limêj nekiriyi, limêja min li ser min çûyi, ezê ana li ser sêla sor nimêj bikim, dehari adinê vay teştek nan li ber teyi, û tu nên lêdixe û tu dibê  ez ji birçîna mirim, dibê ez dewletîbûm feqîr li dora min pîrbû, min rojekê nanek neda feqîrekî min kesek têr nekir, min nanek rokê deaba

feqirekî minê ana bixwara jî(mele mustefa ev çiroka gotiyi) ev jî çû . dehari li cem a kun li piştêyi dibê te xêri, dibê havîn bû min holik çêdikir dolabamin hebû ava min kunê kevnar bû, cemidîbû rêwî dehat digot hela ka tasek ava cemidî, welle yadê ez nadim we, wûn jî pîreki, wun jî ji xwe çêki û bila ava we hênik bi, min rakê tasek av deaba faqîrekî, minê ana vexwara, min nedayi tu kesi. dehari cem pîreka xwe nifta xeznê did bavê xwe û jinik dibê mizgîn lite qedera te ê ji me çêtire(cin) him dewlata te piri him îşê te başi, Rihme li gora dê û vavê gohdara.

## 7.2 MOTÎFÊN Dİ ÇÎROKÊ

Cin: Di çîrokê me di tim qala cina dibê, dibêji ê ji me çêtir, cin bi hêztiri,xurtiri, di cîrokê te xizmeta însana diki,

Beq: Beq tişte kû nayê hezkirin didi motifkirin, insan ji beqa hez naki û dixwazi jê dûr bikevi, weke hin gotin heyi dibêjin dûrî beqa herin kû wun wan bikujin wê belalûk li we bê. Di vir de jî ajalekî nexweşi lê dibi qismetê zarok.

Sê law: di çîrokên kurdi hin hejmar tim tê bikar anin, sê law, qirnê nebî sê carayi…

Qeder: di baweriya olîde bawerî di pêşdeyi, qeder jî wekî k^ü tiştekî nayê guhertin tê pêşiya me. Qedera law bekeqbe jî tê qebûlkirın

Bawerî û dinya din: Di çîroka di û di jiyana me di em tim bi bihûşt û cehenmê hevdû terbiyedikin û hevdi ditirsînin. Li vir de jî bi serdema dîtina ca xwe hin ulûm dibîni, kû mirov li vê dinyaya fanî çi biki wê dinyaya ebedî jî wê bivîni didi xuyakirin.

Sêv : Sêv avêtin nîşaneya qismeti. Sêv jî motifeke di hin çîrok dê bikaranîn, sêva jahr jî di hin çîrokan de heyi. Di vê çîrokê him sê cara bên avêtin him jî dibi sedema jawaca xort.

# 8. SİLTANA KÛBAR Û EHMET Û ZİLFO MALA ONDEBAŞÎ

## 8.1 KURTEYA ÇÎROKÊ

Ahmet û mehemet hebû mehemet got haaa Ahmet, em feqîrin nayê hesabê me em li welatê xwe hemaltiyê biki, nayê hesabê min hadê emê xwe bera vê beriya jêrîndi emê biki kî zani kî lawê kêyi, got temam got de bira xweha me jî bi mere bê , ewê nanê me çêki şîva me çêki, emê jî ji xwe bixebiti, kî zani kî lawê kêyi, got temam, got çû welatê ûrfayê , mala ondebaşî serdarê ûrfayi, got çû hinda zilfo got ha zilfo , got ha, got zilfo em hatini ji xwe li vira bixebiti, hema odekeki hebi emê ji xwe têkevi, emê sibê heri bixebiti, emê êvarî bê serê xwe dîni got temam, welleh kar piri.

mehemet û ehmet dixebitin dilê mehemet dikevi xweha zilfo siltanê. siltanê ji heft birayê xwe dib^ji zilfo û mehet dikevin berhevdû her heft bira û mehemet zibo siltanê tê kuştin. siltanê jî bi pismamê mehemet ahmetre tê markirin. ahmet ji dêvla zilfo dibi serokê rihayê.

## 8.2 MOTÎFÊN ÇÎROKÊ

**Heft,:** hejmara hefta di vir de motifeki, heft bira

**Neyartî:**din ava kurda tim tim dujminatî heyi û bi fesadiyê tevger û yekîtî belav dibi.

**Fesadî:** ziman dirêjî tim dibi, sedema nebaşiyê. Û di vir de jî pewvek dibe sedema kuştina heft bira ê evindarekî

**Mervantî:** li xerîbiyi, mervantî xurtire, li hember kesên nenas meriv tim hevdû digri, piştgiriyê didin hevdû.

**Evîn:** Evîn tahmek pîrozi lê mixabin tehma tûj hertim didi dilê civatê û mirovan, ev jî ji ber çanda me hinkî tenge, li gor cîhanê hin tiştî te em nayê guherandin.evin di virde jî bûyi sedema êşê

Namûs: motifeki lê bi tena serê xwe dibe mijarek ji  nerîna namusê çiye, namûs bûyi parastina mêra, jin namûs tê dîtin û mêr jî parazvan. Di vê çîrokê de jî wer tê xwiyakirin .

# 9. NE SAR NE PEYA

## 9.1 KURTEYA ÇÎROKÊ

Dibê radibi yixtiyara giştikî dikuji ka hikumeti ka kî yi nizanim dikujin dibê yek bavê xwe vedişêri û dinya kîz dibi û dibê bi cahila kar diki. Diherin dibê hema sibê de nema dihêli em pişta xwe ras bikin û gihê diçinin , dibê bavê mi bav jêr dibêji : Lawê mi carÊ pişta xwe rak û rast biki du ta giha rahêlê bixwi û tê pişta xwe bi vî hawî rast biki. Dibê wextê j ite re got : Bê tiştê mere jê nexwi mere hewente diçini.Qey xwarin tê heyi em diçinin. Em ê bixwin jî , ji bo na tu pişta xwe jî rast biki , nehêlin millet pişta xwe rast bikin û hema pê kar diki cehilê ana wanî yi û radibi diheri û lawe wî nav cahila giştika ew pişta xwe rast diki . Du ta giha diçini davê ji devê xwe û dicû dicû dixi devê xwe. Ê dibê ka ji bo çi te xwe rast kir. Dibê tiştê mere jê nexwi mere diçini hewente va xwarin tê di xwarin tê de yi jî. Hinkî dixwim mêrik lê dimîmi heyr.

Ma derewa diki bavê mi li kura heyi. De ez nizanim dibê sibê ne sar bê ne peya bê. Divê bavê wî ka ez çilo bikim. Daxşikekê bigir û li ser daxşikê sarê wextê tu hat cem wan. Ka mi ji te re go : Ne sar bê ne peya bê . Ê dî neva ez li kerê mi. Ez ne sar im ne peya mi

## 9.2 MOTÎFÊN ÇÎROKÊ

Kal ,yexçiyar: zanebûni ,aqilmendîyi.

Kûçik: li xwediyê xwe xwedî derketini.

# 10. FATMA SÊWÎ

## 10.1 KURTEYA ÇÎROKÊ

Keçikek berê sêwî ye. Dilê pîrekê dikeve bavê wê , dibê : Keçikê çima bavê te nazewici. Bavê mi dibê heta kincê ca te di bixwçikê de nerize ez nazewicim. Dibê her kincê ca xwe têxe curn bikuti bikuti û bê bavo va kincê ca mi riziya yi. Ew ê wer biki û dibê bavo mi îro nerî kincê ca mi riziya yi. Dibê lawê mi heta kîso neri ser darê ez nazewicim. Dibê tu zarokî wê texde l ite bê , ez naxwazim ana jinê bînim. Dibê bavo wele ji xweri bizewici. Jinêk divê ka bavê te bi kîjan alî ve deri dibê rê min bid, Hela kîja alî deri her kusiyakî bigiri û heri dîn ser darê . Deri kîso datîni ser darê bavê wî va tê çavê wî lê dikevi va kîso li ser dareyi. Dibê bavo mi îro dî yi kîso li ser darê bû. Dibê erê law ez hatim mi dî li ser darê bû

Ew jî ka dawet li gundê wan çê dibi, keçîk û jinik û qîza xwe heri dawetê vê ka radibi bixçikê cediki şimikek zer tê de yi û qatek kincê pir xweşik tê de yi. Keçik li xwe diki ew diheri dawetê diheri dawetê. Lawê axê dev ji dergîsiya xwe ber didi çavê wî wer li ser keçikê yi. Dibê : Yarebbî nigê wê terlikê zer wer bi şewqi û kincê wê heqas xweşik i. Mi hînê qîze wanî nediyi. Ev keçik herik ku ez ê dev ji dergîsiya xwe berdim, ez ê vê ya bixwazim û bera pê didi .

Go tenûrê vedikin keçik di tenûrê de yi , destê keçikê digirin û tînin. De Fatma kincê te di kudeyî derxi , ez zanim kincê te heyi ; va terlika zer mi anî ferek wê li cem te yi û keçik diheri derdixi û li xwe diki terlika xwe diki pê û lawê axê li pişt xwe diki û diheri. Ew ji xweri miradê xwe sa dibin em jî li malê şa dibin.

## 10.2 MOTİFÊN ÇÎROKÊ

**Axa:** lawê axa dewlemendiyi.

**Çêlek:** bereketi. Bi goşt,şîr û histiyê xwe

**Sola zêrîn**: sihîre,

**Dêmarî:** nebaşîyi, çav berdana mali

**Kîso**: tişkê kû hebûna wê zorbê , dibêjin kîsa çû ser darê

# 11. QAFÊ NAV COT

## 11.1 KURTEYA ÇÎROKÊ

li gor qederê yek heyi kû gerek 40 mirovî bikuji lê 38 hep kuştiye û dimri, piştî wexte kê kecek bêhemdi hin arî dixwe ew jî serê wî mirovîye. keçik humle dibi zarokek çêdibi ji wê keçê û dehari mala milûk li wir jî ev zarok dibe sebeba kuştina du kesan. û karê wî diqedi.

Dibê zilamek yixtiyar diheri ji xweri cot diki. Jina wî miriye ew û qîza xweyi diheri cot diki û rakê cot diki dineri qafê însanekî li ber cot radibi ji betalî radihêli li ser tahtekê datîni û hûr diki , diki wek êm û diki nav desmala xweyî ser desta û dıheri rakê duda keçika wî kinca dişo berîka bavê xwe dineri tişkî spî tê de yi. Tiliya xwe tê dadiki dixwi şêrîn i û temamî dixwi.

MA tu ji xanimê çêtir i Wele tê jî bê , cariyê taxzî dikin dinerin zilami , lawik dibê a masî , a bi vi ya keniya . Dibê zilam xwe kiriye pîrek û ji pîreka te ri cariyi diki. Ê merik jina xwe û cariyê jî dikuji . Qîzek wî û qîzek wî ya heyi. Dibê qedera çel însanî li iniya mi bû , gerek çel qetil li iniya mi ba . Dibê dudu ma bû va qetla herdû yan jî ket situyê min illa qetila van a ji ruyê mi ba. E va ha benda herdû qetla bû. Ew mêrikê axa qîza xwe didi wî ya , wî ya jî qîza xwe didi axê werê qediya.

## 11.2 MOTÎFÊN Dİ ÇÎROKÊ

Masî: Tiştkî xeyalîyi peyivandina masî

Qafê rut: Baweriya qederê ye

Bawerî: Di jiyanamede çit ê hemberî me em gişî bi ol û qederê girê dide

# 12. QEDER

## 12.1 KURTEYA ÇÎROKÊ

Dibê lawê axakî heyi , ekseriya xwe kiriyi. Çend salê wî qediyay yi digerin nagerin qîzek bava di serê wî kevi nabîni.Dibê Xwedê ez ê nanê xwe tûrê xwe

kim . Ez ê bigerim , ilahî ez ê bi yeka dilê xwe bibînim. Divê diheri digeri EllahSeyîdînê Muhemmed Ela Alî Seyîdînê Muhammed. Dibê ka kî yi ? Xoceyê Xizirî kî yi ? Tê pêşî heşayî derewîna. Dibê lawê mi tu li çi digeri ? Dibê wele ez ji xwe r ili qederê digerim.

Go mê bidiyê. Heyi bi qewl û Resûlê Xwedê dixwazi û tîni. Lawik êvarî dixi wira heta cihê girêk girêk , heya cihê çirandî. Dibê qîzê çi bi te hatiyi ? Çi bi te hatiyi ,kê li te wer kiriyi. Dibê zarokî bûm mi mêvanê ca mi hatiyi û ca mi çû yi nanê xwe berek kiriyi û vî ya ; a wanî ez çirandim û daniyi. Hey wax hey wax. Dibê wele mi li te werê kir. Çi heqê te li mi bû? Ji bo çi te li mi wa kiriyi.

Gotiyi wele waniyi , hal û merselê mi waniyi. Çend sal berê mi eskeriya xwe kiribû , qedera mi , mi go ez ê hîn li bert e rûnêm qeder wêniye. QEDER……

Laîlahhê îllallah Muhemmedun Resûrallah

## 12.2 MOTÎFÊN Dİ ÇÎROKÊ

**Qeder**: li eniya mirov çi hebi wê bivîni.

## 13. Çavkanî yê Zindî

Nav : Halime

Paşnav : Abul

Temen : 80 (rehmet kir )

Kar : kevanî

Navnîşan: zeytinpınar mah. Derik

Nav : Amine

Paşnav : AKSİN

Temen : 60

Kar : kevanî

Navnişan: zeytinpınar mah. Derik

Nav:  Heci hafiz Menduh

Paşnav : Erden

Temen : 72(rehmet kir)

Kar: Mele, Seyda Qesidevan, müezzin

Navnişan : kale mah. Derik

# 14.ÇAVKANÎ

BOZKOYUN, Mehmet. ‘’Beşek ji folklora kurdi’’ Bingöl üniversitesiyaşayan dinler enstitüsü dergisi yıl:1 cilt :1 Sayı 2 SERMAWEZ 2015

KIZIL hayrettin, TANRIKULU Veysi İnternational journal of kurdish studies Beravirdkirina Çîroka Hedlîlîk û Bedlîlîk a bi Kurdî bi Gur û heft Karikan a Brayên Grimm re 2015

ŞALK ,Ali , ‘’Çîrokên Gelêrî yên deresayî ji herema silopiyê Mêrdîn 2018

Qedrîcan, Hewar Sal 1- 1932, Hejmar 12

malpera derikli.com

# 15.PÊVEK

## 15.1 MAR Û MÎROV,  XEWNA PADİŞAH

Camêra gotiye hetanî gihandiye me, yanî aqil û mantiq qebûl diki kû zemanê werê dehari û tê, dibê padîşehekî carekê xewnek dît û xewna wî jêr bû meraq got ezê îlan bikim li car aliyên welêt  gerek werin xewna min bivêjin, bêjin te felan  xewn dîtiyi û tabîra wê jî evi. Kû pê derxin ezê pênc hezar zêr bidimê û pê dernexin jî ezê serê wan jê bikim. Dibê delal bera nav bajara da ji herkesî bang kir.

Got padîşah xewnek dîtiyi, kî her xewna vî bivê û tabîr biki ewê pênc hezar zêr bidê, mûkafat olarak ewê pênc hezar zêr bidê, ê ma kilamatê kesî tuneyi gere her

bivêji te ev xewn dîtiyi û tabîra wê jî evi,  gerek him xewna wî bivêjî him jî tabîra wê bîvêji ,ma hey ew xewna xwe nabêji

Dibê yek perîşani, maxdûri , zarokê wî di ser wî de digrî  efendîm ji birçîbûna hale wî xerabeyi,( la îlakî ekmek mûhtaci) got law hema ezê jî herim hinda padîşah ezê bivêjim xewna te evi û tabîra wê jî evi  wextê kû lê qewimî ji xwe ezê pênc hezar zêr rahêlim ji van gedekê min .  ez her roj dimirim ez halê van dinêrîm ez dimrim. Wextê ku lê neqewimî ji xwe bila serê min jêki ez jî ji dinyayê pak bivim. Welleh ez mirim ,ez xerikîm  ez here roj dimirim. Û dibê bi vî hawî karê xwe kîr,û dibê rabû berê xwe da cêki padîşah lêyi, heke enqereyi,stentenbûli berê xwe da wêderê. Dibê çû marek hat pêşiya wî ê xwedê teala wextê biki diki vana ornekin. Dibê mar bang kirê dibê xorto tê heri ku dibê ezê herim xewna padîşah bivêjim, ê dibê law tu xewna wî nizani padîşah wê serê te jêki, ê got zaten ez ji serê xwe acizim, min gotiyi ezê jî herim, min gotiyi ezê jî kabekê beavêjim lê qewimî pênc hezar zêr wê bide min,eva min xwe xelas kir û ku wextê pênc hezar zêr bide min zar û zêçê min bi rê dinyayê ket wê ji birçîbûnê xelasbivi  wextê min tê dernexist bila serê min jêkin  ezê ji dinyayê pak bivim herim.ê got law ezê ji ter bivêjim xewna wî. ê got tu ji min re xewna wî bivêji tiştkî pir û pir gellekî başi, got biner wê pênc hezar bi tedi. Tê du hezar û nîva ji min re bîni. Law got ez nizamin û ezê herim serê minê heri , ezê xwe bi qurbana tekim ezê hema hezarî ji xwe hilînîm û ê din ezê gişî bidim te. Na na got nêvî bi min û nêvî bî te . erê go dibê rabû mar jêr got , tu çû tê xewna wî bivê te dîtiyi

gur bariyayi û go tabîra wê jî evi. Bê haya te ji te hebi wezîrê te efendim ji yawerê te hinek bi te xayin nekevi, biner tu jî xwe muhafeze biki li xwe miqatebi, zeman zemanê gûrayi

Û dibê rabû bi kêf çû ber deriyê padîşah, jêr got ez hatimi xewna padîşah bivêjim, rabû ji padîşah got welleh way yek hatiyi wê xewna te bivê , got bira! got erê, got bila bê hinda min got law tu xewna min zani , got erê, got law tu xorti,tu eyfi, tu pê dernexi ezê serê te jêkim ha! Min berê soz dayi got ser sera serçavan hey min nizanîbû tê serê min jêki . got padîşahê min te di xewna xwede dîtiyi gur bariyayi , got law erê wellah werêyi min dîtiyi gur bariyayi ê got tabîra wê, got te dît zemanê gurayi xwe muhafeze biki ji kuştinê ji filanê ji bêvanê ji xiyanetê û li xwe miqatebi, dibê rabû pênc hezar zêr dayê û got de heri oxrate xêrêbi , dibê hat cê kû mar jêr gotiyi , mar di devê qulikê li benda wîyi , hema rahişt du hîma û avêt ji marde, û mar bizorkanê xwe avêt ber qulê xwe ji ber kevirê wî xelaskir û bi kevira çû qula mar bi filan û bêvan çû ber derî mar xwe xelaskir. Heke salek ,dusal sê sal qediya padîşah xewnek din jî dît, padîşah got cardin nehewceyi ez lê bigerim herin dîsan bang li zilamê min biki , hema ezê bişînim pê wî dibê rabû hatin hinda wî, delalê wan got padîşah cardin xewnek dîtiyi got îjar şandiyi pê te, got ez nizanim, ey got şandini pê te tu zanibi nizanibi hewceyi ku tu heri, te caradin gotiyi tê vê carê jî bivêji, rabû derket got de wun herin va ezê li pê we werim u berê xwe da hêla mar , got belkî ez bivînim ,çû cem mar , mar jêr got hey mal xirab tê îjar bi kude heri , got ezê herim xewna padîşah bivêjim, ey got law caradin min ji ter got te kevir avêt min min virde wêde serê xwe nekişanda tuyê ez bikuştama , ma bextê te evi hey ucdansîz, mal şewitî ,merhametsîz te çewa ev xiyaneta bi min kir. Ey ana tu zani,got welleh ez nizanim ,got îjar ez ji te bivêjim ,îjar tê bîni? bin sond û selawata wezeliya, got ezê ji ter bînim ezê îjar gişî bînim got na na paramin bîni bes ê din way te hey xwar, viya da te îcar nêvî bîni. Dibê rabû gotiyi bivê îjar te dîtiyi rêvî bariyayi, got tabîrawê jî tê bivê ji zemanê çivayi û zemanê hîlayi û zemanê xapandinêyi, haya te ji te hebi bila tu nê xapandin û xelk çiv û dûva lite çêneki , ê got law ezê xwe bi qurbana tekim, hema ezê gişî ji ter bînim , erê , dibê cardin çû, padîşah got tê xewna mi bivêji xewna min çiyi,tabîra wê çiyi, got te dîtîyi rêvî bariyayi tabîra wê jî ,zemanê çivayi, zemanê fenayi,zemanê hîlayi kes nikari xwe bispêri kesî, temamê millet buyi rêvî haya te ji te hebi. Welhasilî dibê rabû pênc hezar zêrê din jî dayê o got heri oxira te xêrêbi.

Xwedê li pişta te bi mala te avabi, tu meraqa di dilêminde nehêli, zêr li cem min ne tişteki , dibê hat tew riya xwe bi ser mêr nexist û bi cakîdin, derki din çiv da xwe û hat malê, bê ka du sal sê sal çar sal derbasbû çû, padîşah dîsa xewnek dît, hema dîsa şand cem zilamê xwe, du leşker hati ber derî, got law ez nizanim, got nebêji ez nizanim.  Te du sê cara got qey tê vê carê jî  pê derxi, îjar dev ji te berdidi qey? got wun herin ez li pê we werim, got bi soz tê weri? Got erê ezê werim û cardin hêdî hêdî heşa fisek fisek ber bi hêla mar de çû, mar dîsa serê xwe derxist, got tê heri ku, got wellah ezê herim xewna padîşah bivêjim, got tu nizanibi wê te biku ji, got ma ez çerbikim, got ez bi qurbana te bim, tê ji min re bivêji, law di bextê tedemim tê ji min re bivêji law. Got ey ez ji ter bivêjim, carekê te ez da ber hîma, care kê te rê bi ser min de nexist hey mal xerab, ez ji ter bivêjim ey bext bi ter tuneyi çewa bikim, got ezê xwe bi qurbana tekim ezê îjar gişî ji ter bînim, got na na nêvî ji min re bîni besi we famkir?

Dibê îjar tu çû bêje te dîtiyi mîh bariyayi û tabîra wê  tê bê dewra mêhdîyi, însan mulayîm dibi ,însan helîm dibi, însan bi hevdû re rast dibi , însan zirarê nadi hevdû, êdî pişta xwe veki, bê xem rabi , bê xem bigeri û bê xem  û tu ket rûnê fereyê, got ma ez ew qs pîsim ma tû qenciyê bi min diki, û ez jî xerabiyê bi te dikim, û rabû çû cem padîşah, got tu hat, got erê got te dîtiyi xewna xwe de mîh bariyayi, ey got tabîra wê, got dibi dema mehdî, efendîm, mîh selameti, tu êdî bigeri kes zirarê nadi te, wezîrê te yawerê te û êdî xerabiyê ji tû kesî hêvî neki, dilê her kesî xweş bûyi, tije edalet buyi û tije başî bûyi aşitî ketiyi nava mirovan, dibê qet êdî tu netîrsi bê xem rabi û rûnê, tu filitî tu ket fereyê, jêr dua diki,radibi jêr pênc hezar  tîni, dîrek tîni hinda mar, lê dineri mar li hinda qula xwe veketiyi, ne hesaba diki ne filan ne bêvan, zêr anî li ber danî, got welleh li qusûramin neneri vay vê carê min anî,

Got hey malika te bişewiti, got carekê te kevir avêt ji min,te dikira serê min bifiranda , caradin te tew rê bi ser min de nexist, ana dewra mîhayi, ez marim, ma ezê zêra çerbikim, hema ferza wun xayini, zêrê xwe bivi û heri, zêrê te ji min re nelazimi,feqet bextê însana pir kêmi, min du sê cara qencî bite kiriyi, va cara zaten dewra mêhdîyi,dewra mîhêyi, min zanîbû tê bîni û min zanîbû tu zirarê jî nadim in, lema min hesabê te nekiriyi ez li ser qulika xwe veketimim, min zanîbû tê li ber min dîni ji berk û mîh bariyayi, îjar ev zemanê me we famkir.

Nav:  Heci hafiz Menduh

Paşnav : Erden

Temen : 72(rehmet kir)

Kar: Mele, Seyda Qesidevan, müezzin

Navnişan : kale mah. Derik

Sal: Dêrîk  2013

## 15.2 MEÛJ Û HİRÎ Û JİNA QENC

Go zemanê berê meûj dibirin bi hiriyê didan, got pênc şeş sakol barê xwe bar kir, gotin emê herin bi hiriyê bidin , wek ji beriyê duçûn zozên , got carekê dû cara got jinikê ji zilamê xwe gotiyi way hevalê te giş dehari barê xwe bi hiriyê didi hema tu jî heri, ey dibê temam, radibi barê xwe bar diki tevlî hevalan dibi, dehari binya gundekî baran destpêdiki, ji baranê kes kesî nabîni , hevalê wî gişa berê mahzûvanê xwe dîtibû, herkes dehari cem mahzuvanê xwe û vaya li wê rastê dimîni , wî jî serê hespa xwe baradayi û gotiyi hespa min çû kîjan malê ezê jî herim wêderê û hespa wi dehari ber deriyakî disekini,

Malê male, wun mêvana vedihewîni? Got mêvan mêvanê xwedêyi, emê çewa mêvana venehewîni, werin derbasbin, got zilamê te heyi,got erê welleh heyi, ana ne limalêyi wê weri,. Gotiyi werkî baranê dayê deziyakî zûwa têde nemayi, û radibi qatek kincê zilamê xwe dayê û sobe dada, oda wî xwarina wî hazir kir û nifta oda wî dayê, got law vaya jî eşyayê teyi ezê herim cîrana saatekdin ezê werim, got rabû mêrik xwe gûherî, nanê xwe da ber xwe lênerî zilamê wê hat , got selamun aleykum tu ji ku tê ji bi kude dehari, xort mesela xwe got, xort di dilê xweda dibêji hela ji xwe hevalê min pênc şeş hevalbûn çûn cem mahzubanê xwe û kesî negot hela ka hevalê min çû ku, çerbû. Di bêji birako çima tu nên naxwi, dibêji tiştek nabi,

Dibe sibe sawal dikin dibêjin hevalekî me jî hebû, got erê vay li mala meyi, li ser taqê bang dikê , heval heval tû haziri, temam vay ez têm radibi adresa xwe didi xweciyê malê, mala min li heremyayi riya te li wir ket tuyê jî weri cem me, mala wî jî li binya gund hinda qesrêyi . got temam. Dibê birako wextê kû tu hat ez ne li mal bim, mala pismamê min di hewşa medeyi, kû tu hat, bang te kir tu hîç neri, mala min jahr be mahr be tê weri rûnê heta kû ez têm , dibêji temam rojekê jêre dibê ji(serê mehê).

Va li nav hevalê xwe dikevi dibê jin waaa way tew barê te ji barê me pirtire, dibê erê welleh wenegot hela hevalê min mahzûvanê wî tuneyi, baranê day ez li ber baranê mam. Min hema rişme li serê hespa xwe gerand û min got her ber kîjan malê ezê jî bivi mêvanê wê malê, pîrek bû jî ez vehewandim, ka mine çerbikira, got tew hevalê

wî jê beecî, barê te ji ême bêtiri, got bang li kesî nekirîyi hema barê min ji mala xwe barkirin, çi hiriyawî hebû dami got temam, serê mehê tê mahzûbanê wî gotibû ezê werim , rojek du roj ma nehat roja sisiya xort ji malê acizbû derdikevi, mêvanê wî tê dibê mala filankes kîjanayi , dibêjin evayayi.

xort ji pîreka xwe ne baweri, mêvan tê canê wê diêşi, tê malê , got mala filankes evi , got erê , hun mêvana wedihewîni ,got welleh nizanim mêrêmin ne li malêyi, ma ezê mêvana çerbikim, pismamê xwediyê malê dibêji xêri tu çi digeri ka wer mêvanê min be, na welle pismamê te gotiyi ez li mal bim ne li mal bim gerek tu rûnê , vayi pîreka wî ji min werê jî dibê ji jî min gotiyi ezê rûne. Ka wer mala min dibê, diki naki pismamê wî bi zor dibi mala xwe û va tê lê dineri çûyi mala pismam, got ka mêvanê me nehatiyi, got yek hatibû, çi zanim ne wek mêvana bû, gotiyi malê malê ,heta ez derketim tew min nerî kû çûyi. Werrêyi got erê, çû lênerî way mêvanê wî li wir rûniştiyi, dibê birako haydê malê, ma min ne gotibû heta ez bêm tê limalê rûnê, ey ha mala te ha mala pismamê te, vay hema em liviri, na tê bê mala min, radibi dibi malê, elokekê serjêdiki didi pîreka xwe dibê biperitîni ji mer biki şîv, jin her perrekî jê diki dibê ne bixêr û nebi ahla, mêrik jî di pacêde lê dineri, mêrik tê çav li jina xwe diki, li ber digeri, dibê ez çûm mala wan pir xatirê min girtîyi jina wî, çi diki nabi, jin her perrekî jê diki dibê ne bi xêr û nebi ahla ne tubi ne mêvanê te bi, di bin çengê te bê, û mêrik jî di pacêde lê dineri, mêvane wî pir beecîyi, di dilê xwede dibê îşev bive şev ya ezê bera xwedim, ya ezê bera tedim, tu ev zilami vaya jî çewa jina teyi, di halê xwede dibeeci, de de de goştê xwe hûrdiki didi ser dikeli û didi ber wan, ma ber kêde dehari, lê dineri nêvîyê perra pêveyi û nekeliyi, û derdê peyvê wê diki naki dibê birako bixwe hema hilma xwe fereh biki, zani ji çi êşiyayi, dibê hilma xwe fereh biki heta sibê bê xwedê çerdiki, dibê temam, du pariya dixwe.

Bi şev wek tiliya xwe kêr biki û xwê têxi xew bi çava nabi, lê dineri hewa sar bû û berf bariya berfek zêde ket, lê nerî xort bi şev rabû ser xwe çû qatek kinc li xwe kir nifte li derî xist û kir paxla xwe mêvan jî xew neketiyi çava, lê dineri . dibê di navbera wî û gundî dujmînatî heyi, ji wan sê mêr , wan jî du mêr kuştîyi dujminayi heyi. Lê dineri way derket mêvan dibê vayê bi kude heri vê şevê, wextê kû derdikevi kêfa wî tê dibê welleh va diki her tiştekê biki, dibê way çenek zilamtî pêr heyi, xort dehari mala dujminê xwe her sê lawê malê di nobetêdeyi li benda wî yi, tê ber malê her sê law dibê bavo way dijmin hat, got berdê wun çi sekiniyi, gotin me berê sê

kuştiyi ma êdî bila bive çar ? qey teslîm bûyi hatiyi, ey temam hela bila weri hundir, tê hundir dibê berxêmin te xêri mesela te çiyi, welle hal mesela min ji vir hata wuri, mêvanê min hatiyi , min elokek serjêkiriyi û her perekî gotiyi ne bi xêr û ne bi ahla min jî got îşev ezê illim tiştekî bikim, ez hatimi qewl û resûlê xwedê ez hatim qîza te bixwazim, tê bidi bidi, tu nadi hey nadi, zaten we sêmêr ji me kuştiyi, me jî ji we du mêr kuştiyi, tu vê qizê didi em berdêlê hev dibi, mêrik dibê temam, bang li pîreka xwe diki kincê qîza xwe lêki zêrê wê bidê, got hema vênî vê şevê ma qey werê dibi, got nepeyivi werê dibi, çima ew dijmin bû, way hat êdî tu nikari qîza xwe bidê, û radibi didê, mêvan jî hîn şiyari di pacêdeyi, dehari hundir, dibê ji mêvan emê vay îşev vekevi wek xweh û bira sibê pîreka min rabi wê bivêji ev çi qahpiki li virayi, têbi vê a qahpik tuyi a tog tuyi a mêvana venahewîni tuyi, tu vê peyvê biki hew, û mêvan dineri, jin kiriyi destêxwe û hat, mêvan dibê ew qas ez qeherîm min dev tiliya xwe kir vay tev reş bûyi, min sond xwaribû hey te tiştek nekiriba minê bera te da, tu va zilamayi va jî pîrekateyi, û dibi sibe jina wî dibê va çi qahpi. Çi togi, mêvan got a qahp tuyi a tog tuyi a mêvana venahewîni tuyî, mêrik bi çengulê wê digri û dibi mala bavê wê layê apêwêyi, a ji wer qîza we bi emrê xwedê min berada . vay min ji xwer jinek anî, meseloka min li gara rehme li gora dê û bavê gohdara.

Nav : Amine

Paşnav : AKSİN

Temen : 60

Kar : kevanî

Navnişan: zeytinpınar mah. Derik

## 15.3 SÊ LAW Û SÊV

Dibê carekê sê lawê yekî hebûyi, dibê bavê wan jêre gotiyi lawê min di qedara wede ezê herkê sêvekê bidim we.

Dawet çêbû heri sêva xwe bavêji, li serêkê ket ezê ji wer bixwazim dibê êmezin dehari dawet çêbûyi, dehari deavêji serê qîza miftî dikevi, radibi ji xwe bi dawet tîni, dibi ê ortê  ew jî wextê zewaca wî çêdibi , tê dawet çêdibi, dibê de heri lawê min tu jî heri sêva xwe beavêji, deavêji li serê qîza qadî dîkevi, herda jî ji xwe bi dawet û bi şeref tîni, dibê ê  çûk jî wexta wî tê ew jî dehari sê roja dawet çêbûyi,  ew jî sêva xwe deavêji sêva wî li hewa ziz dibi ziz dibi dehari li ber kevir kî li serê beqê dikevi, dibê de lawê min qirnê nebî sêcarayi de sibê jî heri, vêcarê de ji hêlek din sêva xwe deavêje dîsa sêva wî li hewa zîz dibi zîz dibi dehari li serê beqêe dîkevi. Dibê welleh lawêmin hew îro mayi dehari dîsa sêva wî li serê beqê ket, dibê her sê roja jî li serê beqê ket ,radihêli bêqe bi xwer dibi, welleh bavo her sê roja jî lî serê beqê ket, ey dibê welleh lawê min qedera te evi, ez tuydin ji ter nînim, her wa li perrêgund xanîkek heyi min her dû birayê te cîhê kir her tu jî cîhêbivi, her ji xwe têkevê.

Dibê golik molik ketiyê tev pîs bûyi, dibê rojkê du roja dikevê xwe diponijîni , dibêma va halê ez têdeyim ne tu hali, ez rabim ji xwe karekî bikim, dibê qismetê wî firayi, wa dibê wer karê min wa dibê wer karê min, radibi karê xwe diki êvarî tê malê dineri xaniyê wî paqij bûyi, dibê dibi roja din tê dineri xaniyê wî sipî bûyi av heyi di hundir , şîva wî çêbûyi, xwarina wî mala wî giş xweş bûyi. Firax der giş çêbûyi,  dibê qey kevanî di mala min de yi, hela ez xwe li bendême bêva çiyi, dibêderiyêxwe digri û di qulika derî de lêdineri, got tip wek tiştekî li orta malê ket hew lênerî qîzek xweşik di orta malê dehari û tê. Tê derî vediki lê dineri postê beqê li ser alifekî kuçiki çiyi. Xwe çendiki çakmak pêdixi, lo lo lo postêmin neşewitîni, dibê haw haw ez li asîmana yek weke mîna te digeriyam , xwedêli erdê yek wekte damin, û dibê ezê bişewitînim, dişewitîni, êdî nema post li xwe diki, eşkere dibi.

Dibê du ro sê roj dehari bavê wî dibê hela lê ev layêmin gerek wecê wî nexweş ba bê kevanî bêhal bêmal wecê wî bi kêfi, êdinê wecê wan ne wek êviya xweşi, hela ez herim mala wî bê çewa diki, tê lêdineri bûkek li hundir dehari û tê tû dibê xwedo tu lê bineri, qelbê wî disekini dibê rep û dikevi xwarê, heta demekê heş bi seri tê dibê

bûkê tu bûka kêyi, nawê wî hildidi, dibê bûka teyim, zilamê te kiyi, navê layê wî hildidi, dibê êvarî bila zilamê te bê cem min îşê wî heyi, tê dibê bineri sibê tu textekî bîni gundî giştik li ser rûnê gerek cê gişa hebi, ciyê yekî jî tunebi ezê serê te jêbikim, tê malê dibê bavê min ji min re got, ka ezê text çilo hal bikim ezê çewa bikim, dibê şikeftek heyi, way di vi girîdeyi, heri hundirê şikeftê du dirêncek xwe berdidi, wextê ku dora te bû wîl wîl netirsi ha kes tiştekî bi te naki, wê beji zava tu bi xêr hatiyi, bê nav xêrêdebi, qîza we ez şandimi textê nên gotiyi emê li ser nên lêxi, û radibi text tîni her yek li ser rûdine cê duda fereh dibi, her yek ser rûdinê cê duda fereh dibi.nebû serî jê nebû

Dibi radin cardin tê, car jî li bûkê dineri, cardin jî dil lê diqelibi heta heş bi serî ve tê cardin dibê zilamê te hat bila êvarî weri cem min, dîs law dehari dibê bavo te xêri , dibê heri gurşiyak tirî bîni bila gundî gistik jê bixwe, yek ji vî tirî nexwe ezê serê te jêkim. Dibê wecê wî zêde pîs dibi, dibê va çi feleki bavê min jimin çi dixwazi, tê ji jinikê dibêji, dibê kuro metirsi, tê dîs heri xwe di şekeftê berdi, zêde ewê deng weri, biki wîl wîl hîç metirsi, û bê hema wun dinav xêrêdebi xwedê xêrê bidi we, bê welleh qîza we gotiyi heri ji dêliya mala bawê min bila gurşiyak tirî bidi te emê ji xwe bixwi, dehari gurşiyê tirî jêr tîni, gundî giştik tê jê dixwe, her hebek dixwe du hebêdin pêv tê, dineri di destê wan di dibi bereket, ew jî dehari.

Dibi siba din dîs tê dibê bila zilamê te bê, dibê bavo te xêri dawa çi l imin diki, dibê tu nizani nifta xezna min ca te veşartiyi, heft sali ca te miriyi, herbê ca te nifta xwe kiriyi ku , dibê ma yarebbî camin heft sali miriyi ma wê çilo bipeyivi, dibê de va ez ji ter dibêjim, tê malê êdî digrî, jinik dibê çima tu digrî, dibê welleh bavê min j imin re wer gotiyi.

Dibê haydê em heri ser mezel û tu hîç metirsi emê ayetekê bixwîni deriyê mezel wê vebi û dehari dibê hîç tû netirsi, tê rast heri cem ca xwe , va dehari ayatekê dixwîni û derê mezel vedibi, û dehari dineri kû jinek kunê avê li piştê yi dibê hahoo ez ji tîna mirim,hahoo ez ji tîna mirim, dibê ma xwehamin ma kunekî wek ecêba li pişta teyi ma tasek av vexwi, dibê emir tuneyi birayê min hela tu çû weri ezê derdê xwe j ite re bivêjim.

Dehari dineri  kû yek di ber nan deyi û teştek nan li beri û dibêji haho ez ji birçîna mirim haho ez ji birçîna mirim, dibê ma xwaha min tu nên lê dixê hema rahêli bixwi, dibê emir tuneyi hela kengî tu çû hat ezê derdê xwe ji ter bivêjim.

Dehari cem yeka dinê mala wê têv xalîçeyi raxistiyi, û li quncikekê li ser sêlek sor limêj diki çongê xwe bera erdê didi, dibê qîr , eniya xwe bera erdê didi dibê qîr dibê haho çonga min çû haho enîyamin çû, dibê ma xwaha min mala te tev raxitiyi, şujde û xalîçe tev raxistiyi ma li ser vana limêj ki tu çi li ser sêlê diki, dibê hela tu heri weri ezê derdê xwe ji ter bivêjim.

Dehari dineri kû wa cawî di quncika cennetê de rûniştiyi, dibê layê min tu û livêdera madê te hîn neqediyayi, tû hatiyi vêdera çi?  Dibê welleh bavê min ez şandimim gotiyi hela bê nifta xiznê kiriyi ku, dibê taqikek hey ili ber beştadeyi, nifta xeznê min kiriyi wêdera, û bavê te dûjminê te yi , ne dostê te yi, û êdî bavê te kîja şerda da berte gerek tu bavê xwe bikuji, vediger tê hela vê jinika tu li ser sêla sor limêj diki, dibê derdê te çiyi, dibê min mal radixist û min ji malê hezdikir, mala xwe min dixemiland ji kêfa malê min limêj nedikir, min rojekê ferza limêjê li ser van xalîça kiriba minê ana li ser limêj bikira, min li ser limêj nekiriyi, limêja min li ser min çûyi, ezê ana li ser sêla sor nimêj bikim, dehari adinê vay teştek nan li ber teyi, û tu nên lêdixe û tu dibê  ez ji birçîna mirim, dibê ez dewletîbûm feqîr li dora min pîrbû, min rojekê nanek neda feqîrekî min kesek têr nekir, min nanek rokê deaba feqirekî minê ana bixwara jî(mele mustefa ev çiroka gotiyi) ev jî çû . dehari  li cem a kun li piştêyi dibê te xêri, dibê havîn bû min holik çêdikir dolabamin hebû ava min kunê kevnar bû, cemidîbû rêwî dehat digot hela ka tasek ava cemidî, welle yadê ez nadim we, wûn jî pîreki, wun jî ji xwe çêki û bila ava we hênik bi, min rakê tasek av deaba faqîrekî, minê ana vexwara, min nedayi tu kesi. dehari cem pîreka xwe nifta xeznê did bavê xwe û jinik dibê mizgîn lite  qedera te ê ji me çêtire(cin) him dewlata te piri him îşê te başi, Rihme li gora dê û vavê gohdara.

Nav : Halime<br>
Paşnav : Abul<br>
Temen : 80 (rehmet kir )<br>
Kar : kevanî<br>
Navnîşan: zeytinpınar mah. Derik

## 15.4 SİLTANA KÛBAR Û EHMET Û ZİLFO MALA ONDEBAŞÎ

Ahmet û mehemet hebû mehemet got haaa Ahmet, em feqîrin nayê hesabê me em li welatê xwe hemaltiyê biki, nayê hesabê min hadê emê xwe bera vê beriya jêrîndi emê biki kî zani kî lawê kêyi, got temam got de bira xweha me jî bi mere bê , ewê nanê me çêki şîva me çêki, emê jî ji xwe bixebiti, kî zani kî lawê kêyi, got temam, got çû welatê ûrfayê , mala ondebaşî serdarê ûrfayi, got çû hinda zilfo got ha zilfo , got ha, got zilfo em hatini ji xwe li vira bixebiti, hema odekeki hebi emê ji xwe têkevi, emê sibê heri bixebiti, emê êvarî bê serê xwe dîni got temam, welleh kar piri.

Got ehmet û mehemet xebitî wek salekê, zilfo got ha mehemet tu nabi hevalê meyi çiftûkê emê medrebê biçîni, got welleh pismamkî min heyi got çi îşê te ji pismamê teyi, got na welleh pismamên jî heyi hema dilê min Ji te dixwazi, em vay heft birayi, tu jî bivi hevalême, got de başi, êvarî got ehmet dibêji ez bûme hevalê va birana, ew heftin ez jî bûme heyşt, got ehmet dibê ma tevde sozdabû , ey belki nebû çewa nebû, ez û tu tu tenêyi em pismamê hevdûyi û vayê tê ji piştamin heri, got welleh zilfo dibê weri bive hevalê min ezê bivi hevalê wan. Got rabû çû bû hevalê wan, û ehmet tenê ma li vir, Ahmet got welleh ezê ji odeka te derkevim, bavêkê xweha te ne bila şîva min çêki û ne jî bila kincê min bişo, wexta ku min û te bi hevra kar nekir, ne kinc ne jî xwarin lazimi, got ehmet jê xeyidê û mehemet tenê bû hevalê zilfo û hevalê medrebê. Got çû nav erdê medrebê çiftûk pê werdikin, got zilfo got ha mehemet vayê çend xet mayi emê heri malê heta tû biqedîni tê jî weri, got başi.

Zilfo û birayên xwe berê xwe da malê, mehemet jî qedand berê xwe da luquntê, got siltanê jî xweha heft bira bû ji xwe nanê luquntê çêdikir, û mehemet çav bera siltanê da bû, berê xwe da siltanê kû tiştekî jêre bivêji, siltanê got qirika mere sî ûsî dirênceyi mere li ku vegeri ew başi , tû nebêji baştiri got na welleh gotinek min heyi siltanê got de hadê bivêji got ê wê birî dibê ezê birî, hela tê bivê bê peyva te çiyi, got hesp li ber luqintê girêdayi tê bê emê heri , got temam ana heta sibê sebir biki, got temam erê welleh başi.

Got her heft bira hat siltanê nigê xwe li beroşa tirşikê xist şotika tirşikê çû heta wîyalî, , gotin ha siltan te xêre tu beeciyi te niqê xwe li tirşikê xistiyi, got mala ondebaşî ne bênamûsba ez li bênamûsiyê nediqewimand. Got çiri çerbû , got we ez û mehemet spart hevdû û wun çû malê welleh dilê mehemet di mindeyi, gotin em ana

weri di naw dawa te debi emê bivêji qey sari xwe germ diki, got na welleh ana mehemet hatiyi gotiyi tu wer ezê te birevînim, hela bê kî gû xurêteyi, got ey welleh vaya bû bênamûsî, bila mehemet bê hinda medreba caso, emê cota cota şerbiki , got zilfo ji mehemetre got te ev peyva ji siltanê kiriyi, got erê min got li qûsûra min neneri, peyvek bû min got got nabi sibê weri medreba caso emê meytê hev raxi.

Got mehemet çû ji xweha xwe zelişê got hela heri bang li Ahmet ki, dilê min dişewiti, got weyla tu bi qurbana serê ehmet bi çi zikê te dişewiti, got welleh hema bila bê peyvek min jê heyi, got ehmet hat got mehemet çiyi te xêri, got welleh mesela min û siltana kubar ji vir heta wuri, dilê min gelkê ketiyê panzdeh caran ketiyê, û min jêr peyvek kiriyi, way birayê wê dibêweri medreba caso, ehmet dibêji welleh te va ciya jî lime herimand, de ha îjar emê bi kuda heri, dibê berê min j ite gotibû ew heft birayi zengînin erdê wan heyi, li ûrfayê xurtin tu nikari pê, min ji ter got te bi amin nekir, te ev cî jî li berme herimand emê bi kude heri, zelîşê dibe xêri wer wun karê xwe diki, hela ez herim bi siltanê re bipeyivim belkî tiştek ji birayê xwe negotibi.

Dehari dinêri li medreba caso heft kozik vekirine, her kozikek du sê mêr têdeyi, zelîşê bang li zilfo kir got ha zilfo bila dengê derbê we neri surûcê û bila nebêjin zilfo ehmet û mehemet ji bo medrebekê navê xwe xerakiriyi, diki naki zilfo qanih naki, zilfo dibê tu pîreki deheri ez bêm ezê piînekkê li nav zikê texim û sî û sî diranê te tevdî bera nav erdêdim, virde wêde zelîşê dibê

**ez li mala siltanê rûnê bi mervantî,**
**siltanê ne ji min paktir**
**siltanê ne j imin dirêjtire, siltanê ne ji min bedewtire,**
**ne ji min sipîtire,**
**û min û siltanê beavêjin qapanê**
**ez bi nîv lîtirê jê girantirim,**
**dibê ji bo xwedê zilfo tu wermeke**
**nawê şirîkatiya xwe û mehemet li bajarê urfayêde xera meke.**

Dibê heri bila pismamê te û birayê te weri, û tê ehmet û mehemet li pêşiyê radibi, dibê we çerkir ha zelîş, dibê bavo kozik cot bi cot li medreba caso danî, gotiyi here bila pismamê te û birayê te bê, mehemet ji ehmetre dibê ha ehmet ev tev bela mine, tuyê were ji min re bive pişt mêrî, kû tu were meydana şer welle ezê derba ewilî bera eniya tedim. Ehmet dibê welleh birayo nabi ew heyşt hebi tu yeki , dibê na va îşa

min kîrîyi min gotiyi mere di rêkê dehari tenê nexweşi, min gotiyi hema tu jî bi minra bê, ezê têkevim meydanê kengî ez hatim kuştin dûr tê têkevi meydanê vana li ber hevdû pahn dibi pahn dibi mehemet bera wan didi, du, se, çar a dikuji ,zilfo çavek saxi yek nuxsani, dibê ûcaxê zilfo li ûcaxa bigeri, çavê sax li ser lûla tivingê , dibê li bajarê ûrfayê kesî pozê me neşikand viya pozê me şikand, dibê qey yekî sekman di wede tuneyi û zilfo berê berê bera didê bi derba ewilî li qelbê mehemet dixi mehemet hey li wê derê diki xwerê dimri û îjar ehmet derdikevi meydanê,

Dibê nebê ehmet gurê hari,

Kef ji deva dibari

Xokê zelîş de êdî tu şerê min û mala ondebaşî gohdarki

Û ew û ehmet berhev didi, berhev didi, ehmet wan gişa dikuji dibê zeliş de icar bila siltana kubar bila biki qêrîn bila erebakê kirê biki wer van meyta bivi ezê derbekê bera siltanê dim hela bila ez bejna wê bivînim. Dehari bang li siltanê diki dibê hela were tu bi qurbana mehemet bê, meytê mehemet vay livire, meytê zilfo û birayê te vay li virayi em tema dehari li dorê û têyi. Gerek tu erebakê kirêbiki gerek tu van meyta têxê hezar xwerin di zikê mere disekini hema bila ev xwerina ji bila di zikê te de bisekiniya, bila va peyva di zikê te biskiniya. Siltanê dibê law ehmet bisekini min zanîba wê wunî bivi minê bigota haydê mehemet em heri. Dibê carna peyv tê destê mere kû difiri mer nikari xwe bigihînê . dibê quranê ez derbkê bera bejna siltanêdim bila heri ji vê dinya, ew jî wek birayên xwe û mehemet heri ji vê dinyê. Zelîşê dibê nana ehmet tu tu derba bera bejna siltanê nedi û tê wê marki li vê derê bivi sermyanê ûrfayê. Tu derba bera bejna siltanê nadi û siltanê mar diki ew jî dibi sermyanê ûrfayê.

Nav : Amine

Paşnav : AKSİN

Temen : 60

Kar : kevanî

Navnişan: zeytinpınar mah. Derik

## 15.5 NE SAR NE PEYA

Dibê radibi yixtiyara giştikî dikuji ka hikumeti ka kî yi nizanim dikujin dibê yek bavê xwe vedişêri û dinya kîz dibi û dibê bi cahila kar diki. Diherin dibê hema sibê de nema dihêli em pişta xwe ras bikin û gihê diçinin , dibê bavê mi bav jêr dibêji : Lawê mi carÊ pişta xwe rak û rast biki du ta giha rahêlê bixwi û tê pişta xwe bi vî hawî rast biki. Dibê wextê j ite re got : Bê tiştê mere jê nexwi mere hewente diçini.Qey xwarin tê heyi em diçinin. Em ê bixwin jî , ji bo na tu pişta xwe jî rast biki , nehêlin millet pişta xwe rast bikin û hema pê kar diki cehilê ana wanî yi û radibi diheri û lawe wî nav cahila giştika ew pişta xwe rast diki . Du ta giha diçini davê ji devê xwe û dicû dicû dixi devê xwe. Ê dibê ka ji bo çi te xwe rast kir. Dibê tiştê mere jê nexwi mere diçini hewente va xwarin tê di xwarin tê de yi jî. Hinkî dixwim mêrik lê dimîmi heyr.

Dibê îcarê dibi riya dinê dostê te û dijminê te kî ye ? Tê j imin re rast bivêji. Mêrik baqil e , zani wê wî derxi. Dostê mi kûçikê û dijminê mi ca mi ne baş i û ez ê li kûçikê xwe xim. Radibi li kûçikê dixi bi kevira dibelişi kûçikê , kûçik dike qar qar qar direve baz didi û îja tê pîreka wî naxlet li wî şeytên bê çend şiva li pîreka xwe dadi di. Erê kero cehimiyo te ji hevalê xwe veşartiyi , bavê te riya didi ber te . dibê ez ji ter dibêm dostê te xwe ri ji mi re bibêj vêla vêla vêla kûçik teriya xwe kil diki. Dibê ava dijmina min î , a va pîreka mi dijmina min î. A va kûçika jî dostê min î. Te dî va li bavê mi mikur hat. Ma derewa diki bavê mi li kura heyi. De ez nizanim dibê sibê ne sar bê ne peya bê. Divê bavê wî ka ez çilo bikim. Daxşikekê bigir û li ser daxşikê sarê wextê tu hat cem wan. Ka mi ji te re go : Ne sar bê ne peya bê . Ê dî neva ez li kerê mi. Ez ne sar im ne peya mi.

Nav : Halime

Paşnav : Abul

Temen : 80 (rehmet kir )

Kar : kevanî

Navnîşan: zeytinpınar mah. Derik

## 15.6 FATMA SÊWÎ

Keçikek berê sêwî ye. Dilê pîrekê dikeve bavê wê , dibê : Keçikê çima bavê te nazewici. Bavê mi dibê heta kincê ca te di bixwçikê de nerize ez nazewicim. Dibê her kincê ca xwe têxe curn bikuti bikuti û bê bavo va kincê ca mi riziya yi. Ew ê wer biki û dibê bavo mi îro nerî kincê ca mi riziya yi. Dibê lawê mi heta kîso neri ser darê ez nazewicim. Dibê tu zarokî wê texde l ite bê , ez naxwazim ana jinê bînim. Dibê bavo wele ji xweri bizewici. Jinêk divê ka bavê te bi kîjan alî ve deri dibê rê min bid, Hela kîja alî deri her kusiyakî bigiri û heri dîn ser darê . Deri kîso datîni ser darê bavê wî va tê çavê wî lê dikevi va kîso li ser dareyi. Dibê bavo mi îro dî yi kîso li ser darê bû. Dibê erê law ez hatim mi dî li ser darê bû. Dibê lawê mi hey Xwedê kiriyi ez bizewicim her yekê tu biecibîni , tu bîni ez ê bizewicim. Dibê bavo wele pîrekek heyi ; kêfa mi pir ji wê pîrekê ri tê. Tê wê pîrekê bîni . Dibê kî yi ? Mersele pîreka cîrana me yi , wê ya jinbî . Dibe radibi tîni û neh mehê wê diqedi Xwedê qîzekê didiyê. Dibê radibi dibê ez wê keçika sêwî bikujim jê pa bikim. Dibê radibi keçikê dixe ber dewêr û nên nadê û dibê maşella ji birçîna bimiri. Dibê ji canimê Xwedê , Xwedê wî heywanî diki bipeyivi. Dibê keçikê here tasek şîrê mi bixwi û nên nadî te. Tê ji xwe ro ro çê bibi. Keçik şîrê wê dixwi , ro ro weckê wê xweş dibi. Dibê va keçika namiri ez nan nadê mê jî wa namiri. Ez ê wê li malê bihêlim tûm birçî bibi qey . Qey tişkî li çol molê wa namiri , ez ê îcarê li malê birçî bihêlim maşella bimiri. Dibê li malê rakê duda dimîni , çêlek ba dikê. Dibê ; va ez ê bimirim wê mi şerjê kin “ ez ê goştê xwe tevda tahl bikim ; wê bi te tenê şêrîn bikim û go mê birjînin bê na na goştê mi nerjînin bê hema ez ê ji xweri bixwim. Dibê radibi dixi sîtilekê dikelîni şêrîn dibi keçik dixwi. Meha wê diqede dibê hestîka jî navêjin têxe nav bixçikekê têxe erdê.

Ew jî ka dawet li gundê wan çê dibi, keçîk û jinik û qîza xwe heri dawetê vê ka radibi bixçikê cediki şimikek zer tê de yi û qatek kincê pir xweşik tê de yi. Keçik li xwe diki ew diheri dawetê diheri dawetê. Lawê axê dev ji dergîsiya xwe ber didi çavê wî wer li ser keçikê yi. Dibê : Yarebbî nigê wê terlikê zer wer bi şewqi û kincê wê heqas xweşik i. Mi hînê qîze wanî nediyi. Ev keçik herik ku ez ê dev ji dergîsiya xwe berdim, ez ê vê ya bixwazim û bera pê didi . Erê dawet tê ferikandin keçik baz didi berî dawetê baz didi. Cihokek avê tê ber wê xwe ji ser çip diki

terlikek wê ji nigê wêdikevi , lawê axê radihêli terlikê diheri malê. Dibê sibê dibê berbû giştik werin. Ev terlik ji nigê kêr bû , ez ê wê ya bixwazim. Ez dergîsiya xwe nema tînim. Giştik tên dibê gelo kes ma nigê kesî nayê , dibê kes ma ye. Dibê : Wele Fatma Sêwî ma.

Fatma jî li mala xwe taxzîkî pîsik i. Dibê hek çilo be ille ez bibim di nigê wê kim , tê dixi niga ji niga ri dibi. Dibê ez ê vê ya bixwazim , jinik dibê : Evaka pîssik evala sêwî tê çer biki jê. Dibê îşê we pê tuni , illa mi vê ya eciband ez ê vê ya bînim. Û dibi radibi derhal dixwazi dawetê ji wê ri lêdixi û dibê gerek ez herim , wê keçikê bînim , lawê axê dibêji; baweriya min bi berbû nayê . Ez herim wê jinik hawakî tê bikin û tê radibi jin qîza xwe dixi xirbê û wê ka jî taxzî dixi tenûrê. Wextê berbû tê hewşê ji bo keçikê bibin

.

Dîk ji hewşê direvi ser dîwêr û dibê ; qaqila qaqila qaqila kî helik melik paş vir di Fatma sêwik tenûrçî dibê , ha weyla naxlet lê hatê kevirekî dadiwşînê ; bervû giştik ji guha kir. Dibê huş kes deyneki hela dîk dibê çi. Dîk baz didi diheri ser tenûrê û dibê ; qaqila qaqila qaqila kî helik melik paş vir di Fatma sêwik.

Go tenûrê vedikin keçik di tenûrê de yi , destê keçikê digirin û tînin. De Fatma kincê te di kudeyî derxi , ez zanim kincê te heyi ; va terlika zer mi anî ferek wê li cem te yi û keçik diheri derdixi û li xwe diki terlika xwe diki pê û lawê axê li pişt xwe diki û diheri. Ew ji xweri miradê xwe sa dibin em jî li malê şa dibin.

Nav : Halime

Paşnav : Abul

Temen : 80 (rehmet kir )

Kar : kevanî

Navnîşan: zeytinpınar mah. Derik

## 15.7 QAFÊ NAV COT

Dibê zilamek yixtiyar diheri ji xweri cot diki. Jina wî miriye ew û qîza xweyi diheri cot diki û rakê cot diki dineri qafê însanekî li ber cot radibi ji betalî radihêli li ser tahtekê datîni û hûr diki , diki wek êm û diki nav desmala xweyî ser desta û dıheri rakê duda keçika wî kinca dişo berîka bavê xwe dineri tişkî spî tê de yi. Tiliya xwe tê dadiki dixwi şêrîn i û temamî dixwi. Dibê ; çi tiştekî xweş û du meh sê meh diqedi zikê wê gir dibi xelk dibê qîza xwe bikuji i qîza te hawek tê he yi. Dibê : Bavo wele mi nekuji , wele tişkî wanî li dora mi tuni , rokê tiştek berîka te de bû ; tişki spî bû û mi xwar şêrîn bû. Mi giştik xwar , dibê : Xwedê law qey qedera xwediyi çi heyi bela min i ; qafê însên bû weya , min hûr kiriye aniye û te xwariye. Dibê , radibi heft mehê wê diqedi dibê rakê vedirşi , gedek ji devre davêji gedekek jî ji devre davê ji û dibê : Enê ma tu birçî yi? Ka herim cîrana ji te re hinek xwarin bînim. Qasî bihustekê dibe law xelkê bitirsin, tê çilo her cîrana : Ê dibê hela ez ê herim ka tişkî nadi min. Diheri dibê xaltîkê wele ca mi nexweş i , dibê ca e ki yi ? Ca min filankesê yi dibê wele birçî yi. Qe jê re tiştekî bîni , dimîni ecêb mayî. Dibê ; va ya cin i , çî yi ? Navê filankesê got . Diheri radibi filankesê xwehê maç i bi te hat ? Dibê ; Ez verşiyam, ev gedeka jî ji nav verşiya min re hat û dibê ; Tew dipeyivi. Dibê keçê ka xwarinê ca mi re. Kalik êvarî tê dibê : Kalo qurbano , tu betiliyi hela wer rûnê. Ez ê ga girê bidim , dibê :Law tu piçikekî , tê çilo her girêbidi. Dibê : Îşê tep ê tuni , tu hela her rûnê; ez ê girêdim. Girê didi du ro sê ro diqedi dibê kalo ez ê îro teva ta bêm cot. Ma tê bê çi , dibê : Çi îşê te pê yi , min binê çiwalê xwek û bibi. Dixi çiwal têra xwe heqîba xwe çê diki û diheri. Dibê kalo îro sarekê bê , ew ê bê filan gund li ku yi ? Bê ez nizanim , wa gedekê m ezani. Bira bê ez ê rê bidê me , dibê : Tê dibê kalo; kalo filan gund tu zani li ku yi ? Dibê wele ez nizanim filan gund li ku yi . Hele wa gedekê me hinda alavê min i. Her ji wî sewal bik ew dizani. Tê dibê ka law li ser kevirekî yi, dibê va mi law. Dibê vî ya çilo zani. Dibê tu wer kalo ez dizanim. Dibê tê heri mala filankes , dibê hêyvronê di taqê ri bidi pî ye kûçikê wan î rast ê. Distê xwe bide binê pî yê kûçikê mi ne rast e. Dibê wanî got tu heri texma kûçikê xwe yî rastê bikoli. Pere û xizne tê heyi û dibê radibi diheri wê malê ka îşê wî çî yi . Diheri wê malê û diheri rûdinê hêyvronê da pî yê kûçikê wan î rast ê. Dikoli binê xaniyê wan wekî xaniyekî yi . Dineri komek zêr tê de yi , derdixi û tîni. Dibê Xwedê ez herim wî gedekî bikirim.

Radibi çend hebê gir ayrî hiltîni û hinekî dixi dismalekê hiltîni. Sê çar ro diheri lawik dîsa dibê ez ê teva te bêm , ban diki dibê yadê : Xwedê Teala qey qedera Xwedê heyi, tê li mi helal biki. Gelek zahmete min li te hatiyi , ez ê herim êdî hew têm. Law ji bo çi tê heri , tu ji bo çi nayi. Dibê wele ez ê herim , hew qismetê mi li cem we hilat. Ew ê rabi bê , dibê kalo ew yixtiyara wê dîsa weri wextê hat ew ê mi bikiri. Heta mi nego bes tu nebê , tu nebê bes . Ew ê çi pere çi zêr pêr hebi , ez giştî zanim. Ez ê bêm giştî bide û radibi dinêri w ali ser kerê dîsa hat. Divê wele ez hatimi vî lawikê te bikirim. Dibê va heqas zêrê xwe datîni pere zêr çi heyi tevî dide. Dibê law bes i bes i dibê ne bes i. Ji kalo re gotiye heta mi nego bes tu nebê bes. Bê çend hebê gir eyrî hilaniyi , dibê ewan ê gir hela tu derx. Wan a jî derdixi û dibê a van a tê bibi di ca mi di ha. Nan û xwiyê xwe li mi helal ke îja ez ê herim. Va ya dibi mala xwe qîzek wî tenê yi, ne zewiciyi jina wî jî miriyi. Ew tene yi , qîza wî dibê : Bavo ma avê gedeka hanê ez ê çilo xwedî bikim dibê : Qîza mi ew gedeka bi xwarinê yi , ne tu xwedî biki sebra te pê bê û rakê li cem dimîni roya dinê dibê : Xwakê ez ê teva te bêm ser çem. Ma tê bê çi law tu nikari. Dibê îşê tep ê tuni , wele ez karim bim çima ez nikari bim. Diheri dibê gub û xwe davêji nav çem . Keçik bi tepika bi xwe dike û dibê ; ev gedeka bimiri ez ê çilo bikim. Bavê mi bikuji , diheri digeri digeri masiyekî derdixi , tu masîyê li dinyayê werê xweşik tuneyi. Mêrik radibi dibê ; ez ê vî masiyi bibim oda axê gişê ji xweri lê binerin , wê bên çi masiyekî xweşik û dibi. Dibi êvar masî dibi odê giş lê dinerin. Dibên Yarebbî Sibhanallah çi masiyekî xweşik giştik tê lê dinerin û pîreka axê jî tê lê dineri û xulamê wê jî zilami xwe kiriyi pîrel ew jî tê lê dineri. Xwedi destê wî ah wa diperpitîne dibê: ha ha ha masî dikeni , kenê mêsî erşê Xwedê dibê : Masî bi çi keniya yi ? Heta heştakê muhlet ji te re . Te ji mi re bibêji yan a ez ê serê tê jêkim. Radibi tê malê dibê mi çi felek ji xwe ri çê kir, ma kî zani masî bi çi keniya yi ? Radibi digeri dipirsi heşta nabîni , ka kî zani bi masî bi çi keniya yi? Dibê wele îro wê îro serê mi jêki , ka de li mi helal ki. Ew ê serê mi jêki. Dibê kalo tiştek nabi ez ê jî teva te werim. Divê ma tu tenê nikari vegeri , dibê : Îşê te pê tuni , ez ê jî teva te werim ji kalo ri dibê mi go çi tu teva mi ki? Dibê mi çi xwast heta lawikê mi xwestiyî neyê ez navêjim. Mesele ode tije bû du qat sê qat bêtir hebû. Hela bê masî bi çi keniya yi ? Dibê lawik digirî . Dibê lawik çi dixwazi . Dibê cebeş dixwazi. Dibê lawik dîsa digirî . Dibê dîsa ji bo çi digirî ? Dibê hinka kêra mi

diziyê. Dibê vê odê gişţikî taxzî diki , cilê wan hebo hebo ji wan diki dibê ma kes nema . Dibê wele xanimê ma û carî ma . Dibê weleh ew ê ji yan a nabê masî bi çi keniya yi ? Dibê xanimê jî tê taxzi diki kincê wê datîni. Dibê kes ma , dibê : Wele carî ma. Dibê wele cariyê jî bîn , carî xwe di erdê didi ,dibê : Ez nayêm , dibe : MA tu ji xanimê çêtir i Wele tê jî bê , cariyê taxzî dikin dinerin zilami , lawik dibê a masî , a bi vi ya keniya . Dibê zilam xwe kiriye pîrek û ji pîreka te ri cariyi diki. Ê merik jina xwe û cariyê jî dikuji . Qîzek wî û qîzek wî ya heyi. Dibê qedera çel însanî li iniya mi bû , gerek çel qetil li iniya mi ba . Dibê dudu ma bû va qetla herdû yan jî ket situyê min illa qetila van a ji ruyê mi ba. E va ha benda herdû qetla bû. Ew mêrikê axa qîza xwe didi wî ya , wî ya jî qîza xwe didi axê werê qediya.

Nav : Halime

Paşnav : Abul

Temen : 80 (rehmet kir )

Kar : kevanî

Navnîşan: zeytinpınar mah. Derik

## 15.8 QEDER

Dibê lawê axakî heyi , ekseriya xwe kiriyi. Çend salê wî qediyay yi digerin nagerin qîzek bava di serê wî kevi nabîni.Dibê Xwedê ez ê nanê xwe tûrê xwe kim . Ez ê bigerim , ilahî ez ê bi yeka dilê xwe bibînim. Divê diheri digeri EllahSeyîdînê Muhemmed Ela Alî Seyîdînê Muhammed. Dibê ka kî yi ? Xoceyê Xizirî kî yi ? Tê pêşî heşayî derewîna. Dibê lawê mi tu li çi digeri ? Dibê wele ez ji xwe r ili qederê digerim.

Go hela qîzkî bava nakevi serê mi ez ji xwe ri bixwazim. Dibê lawê mi her Xwedê Teala qedera te ji bîra kiriyi. Hîn nuh ji dê bû yi , mesele tu li Heremiya yi , ew jî qîza gavanê Qetero yi. Hîn nuh ji dê bû yi , hîn du ro se royê wê yi. Wele qedera te li iniya wê keçikê yi , ew jî hîn nuh çê bû yi . Dibê Xwedê ez ê herim wê keçikê bikujim , ma va çend sali min ekseriya xwe kiriyi wexta mi derbasbûyi. Ez ê hîn hinda ya pêçekê rûnêm. Diheri mala gavên li ku yi ? Rê didê diheri mala gavên dineri , jina wî nav livînade yi. Pêçeka wê li ber i. Dibê malê hûn mêvana vedihewînin. Dibê mêvan mêvanê Xwedê yi , ser sera ser çava.Dibê wer rûnê , rûdinê. Divê tê îşev li vira bi, dibê : Erê herim nanê xwe berhevkim va îşev tê li vir bi. Ew ê rabi jinikê nanê xwe berhevki , pêçekê vediki lê dineri keçik i. Kêrê didê diki du tîş û datîni. Dibê xwedê va mi kuşt , ma hî vê ya rabi qedera mi li iniya vê ya bi , bera ev jî tune bi. Ew ê rabi malê dibê yadê :Hal mersele mi wanî yi , Xocê Xizir hat pêşiya mi ; ji mi re wer gotiye û ez çû mi , mi ew keçika çirandiyi û daniyi kiriyi du tîş û daniyi. Ew rabû çend salek diqedi , deh salek diqedi. Ew malikê bar ki , bê cîranê wan û rakê du ra lê dineri . Keçika tiki tiki jê tê diheri satilê diheri avê û tê. Ser xênî piyase diki , dilê wî dibijêyê. Ev malika xerîb niha hatiyi. Çi xwiya mi diheri ser keçika wan , ew lawika dibêji. Dibê hela her qîza xwe nadi mi. Dibê law te gotiyi mi qedera xwe kuştiyi. Hela tu jî her qal bik. Bi Qur an heta tu bê xwiya mi diheri ser vê keçikê. Ê belkî Xwedê kiribi. Rabû ca wî diheri qal diki , ma van a dewletî ni ; ew jî feqîrin.

Go mê bidiyê. Heyi bi qewl û Resûlê Xwedê dixwazi û tîni. Lawik êvarî dixi wira heta cihê girêk girêk , heya cihê çirandî. Dibê qîzê çi bi te hatiyi ? Çi bi te hatiyi ,kê

li te wer kiriyi. Dibê zarokî bûm mi mêvanê ca mi hatiyi û ca mi çû yi nanê xwe berek kiriyi û vî ya ; a wanî ez çirandim û daniyi. Hey wax hey wax. Dibê wele mi li te werê kir. Çi heqê te li mi bû? Ji bo çi te li mi wa kiriyi.

Gotiyi wele waniyi , hal û merselê mi waniyi. Çend sal berê mi eskeriya xwe kiribû , qedera mi , mi go ez ê hîn li bert e rûnêm qeder wêniye. QEDER……

Laîlahhê îllallah Muhemmedun Resûrallah…

Nav : Halime

Paşnav : Abul

Temen : 80 (rehmet kir )

Kar : kevanî

Navnîşan: zeytinpınar mah. Derik